

# BERBANG

2/82

U DINE TEMASE KIR

TÊXISTINI

Nawçey Rojhelati Nawe- rast û Pîrsî Filistin.....	3
<i>Dr. Nazım</i>	
Erişên Îsrail.....	5
Nûçeyên Kurdîstana Ira- qê.....	6
Pîrsnema Soderqwest.....	7
Panela Sîsîyê Gulanê.....	8
Panela Sîsîyê Gulanê û Xebata Federasyonê.....	10
<i>Mem Dîmilî</i>	
Demokrateki Militan: Îsmail Beşikçi.....	12
<i>OR. K.</i>	
Îsmail Beşikçi Ki Ye.....	13
Nama Ku Deh Sal	
Ceza xwar.....	14
Pirtûkên Î. Beşikçi.....	15
Bî Kurdiya :	
<i>E. Zêrin</i>	
Jînên Kurd Dî Konfe- ransa Navnetewî De.....	16
Kulmek Evin.....	17
<i>M. Ferzend Baran</i>	
Gorî Serbazî Wî.....	17
<i>A. P.</i>	
Tirêja Berbangê.....	18
<i>Sores Zîrek</i>	
Em Bîbîn Heval.....	18
<i>Birindar</i>	
Çend Gotn Lî Ser Nîvi- sandîna dengdarê n " Dîtin " ê.....	19
<i>Murad Yılmaz</i>	
Xaçerêz.....	21
Karikatur.....	22
<i>Mamoste</i>	
Kampanya.....	23
<i>Dr. Nazım</i>	

**VEXWENDIN** \*

Hevalê(a) Berêz

Kurdên lî Swêdê, jî Federasyona Komelên Kurdîstanê û jî xebata wê ya bê tîrî salekê agehdar in. Jî bo nîvîskarên Kurd yê n ku lî derveyî Swêd dîjin, em dîkarî n bî kurtî bê-jîn, ku Federasyona me, jî yekîtîya hemû komelên Kurdîstani lî Swêdê û lî ser himên demokratîk hatiye damezrandî n. Ger heval bîxwazî n Federasyonê jî nêzik ve bînasî n; me dî vê hejmarê Berbangê (Hejm. 1) de lî ser Federasyonê û xebata wê bî ferehî nîvîsandiye.

Federasyona Komelên Kurdis-  
tanê lî Swêdê, deranîna kovareke periyodîk jî roja serî ve kirîbû pro-  
grama xwe. Hun bî xwe dîzanî n, ku weşandîna kovareke periyodîk ge-  
lek xebat û îmkânî n dîxwaze. Bî taybetî dî destpêkê de, dîvê gavên ku tî n avêtî n bî pîvan bî n, himên ku tî n danî n û sinorên tî n kîşandî n zelal bî n. Heke ne wulo be, xebate-  
ke dîr û dirêj nameşe. Federasyon bî vê bawerîyê ket rê û jî bo avê-  
tîna gaveke berbiçav jî endamên xwe yê n resmî redaksiyonêkê pêk-  
anî

Em, endamên redaksiyona BER-  
BANGÊ, dîxwazî n nîha we jî çend himên bîngehî n yê n kovarê agehdar bîkî n:

-BERBANG, dê xwerû bî zîmanê kurdi û bî tipên latî nî bêt nîvîsan-  
dî n.

-BERBANG, dê dî pîraniya rû-  
pelên xwe de cîh bîde hilberîyên çandî.

-BERBANG, pîştgîriya tî koşîna

gelê Kurdîstanê dîke û gîrêdayî tu hêz an dîtîneke sîyasî ya teybetî nî ne.

-BERBANG, dê jî hemû welatpa-  
rêz û demokratên Kurd re vekîrî

-BERBANG, dê hilberîyên nîvîs-  
karên vexwendî (dawet kîrî) bê gu-  
herandî n çap bîke.

Me lî gor van prensîpan û tenê bî îmkânên nav xwe (nav Federasyonê) dest bî xebatê kîr. Berbangî ku nîha dî destên we de ye, tevî hemû kê masî û çewtîyên xwe hilberîya vê xebatê ye.

Her çîqas me bê we gavê pêşî n avêtî be jî, hun her tî m dî bîra me de bîne. Lew re, em rînd dîzanî n ku gîraniya vê xebatê lî ser mîlên ronakbîrên welatparêz e. Jî ber vê yekê, me we jî serî ve wek nîvîska-  
reki (ê) Berbangê dîtiye û jî nîha ve dî rûpelên wê de, cîh dîdî n we. Fermo, cîyên xwe yê n bî rûmet dagîrî n. Me dest pêkîr, hun bîdo-  
mî nî n.

Em jî hemû pêşînyar, pîrs û da-  
xwazên we re amade ne.

Bî slav û hîrmetên me.  
**REDAKSIYONA BERBANGÊ.**

Me vê namê, bî hejmarê yekem ya Berbangê re jî gelek hevalan re şand. Lê gelek hevalên dî n jî hene, ku navnîşanên wan lî cem me nî nî n.

Me, jî ber vê yekê, weşandîna vê namê dî cî de dît.

SAL 1  
HEJMAR 2

**BERBANG**

TEBAX / 1982

BERBANG  
Kovara Kurdi, Xwedî:  
Federasyona Komelên  
Kurdîstani Lî Swede.  
Biha: 5,- Abona Saleke  
50 Skr / 25 DM.

BERBANG- Kurdisk Tid-  
skrift. Ansvarig Utgivare:  
Kurdiska Riksförbundet.  
Pris: 5,- Prenom: Enskilda  
50 :- / år, Organisationer  
100 :- / år

NAVNISAN-ADRESS:  
Sveavägen. 135 N.B.  
113 50 STOCKHOLM  
Tel: 08-33 07 09  
Postgirot: 643880-8  
Stockholm/Sweden

Rûpelê rû :  
Wênayek jî Bêrûdê



## NAWÇEY ROJHELATÎ NAWERAST Û PIRSÎ FILISTÎN

Dr. Nazim

Ke be çaweki zanistiyanê we temaşay wêney siyasi ekeyn, le seranoci **ûşay** em serdemey ê-me da, eweman bo derekewê t ke gişt hêze siyasiye cewaz **cewaz û** renga w renekani be têk ra dû grûpi (kampî) sereki pêk **dênan û** em du grûpe dijmini **jryan û** nemani yektir in. Yekê kiyani bîzûtnewey şoreşgêri cihani ye. Ewê tiryani İmperyalizmê cihani ye. Yekemiyani pêk hatiwe lem hêze serekianê: xebati rizgari-niştimani gelani çewsawe w **bindest û** koloni kraw, têkoşini çini karkeran le wulate sermayedarekan, koşîşi gelani **azad û** wulatani sosyaêist bo pêşxistini komelga w mroyayeti berew damezrandini ew sistemey ke be tewawî çewsanewey renga w **reng û** cora w cori mirov le sayey da naminêt. Dûwemyani pêk hatiwê lem hêze serekianê: Rejimi wulate sermayedari w kolonyali w kewneperest, çine duwakewtû.

Eger lem rewangayewe temaşay **rûdaw û** konflikte siyasiyekan bi-

key ( le her çi şwê nê yeki dinya da rû bîdîn) le pêwinyan da, emê. wa têgeyn ke nakewine hele w labe-layi w piçir piçiri fikri w çewaşe w win bûni rûy siyasi, her weha le bînereti problemekan **egeyn û** şareza w çaw krawa ebin le hemû core alozeki siyasi, her çende pêçaw **û pêç û** xilîzkawibêt.

Ke temaşey **nawçey** Rojhelati **Nawerast û** cengi **İsrail û** bîzûtnewey rîzgarxwazi Filistin ekeyn ebinin ke em cenge cengi hemû **Ereb û** hemû Cûleke ni ye. Em cenge **cengi** bîzûtnewey rizgari niştîmani Erebi (be serkirdayeti Filistinîyekan) **û** siyonizm e. Wate cengêki **nawçeyiye** nêwan niwênerani ew du **kampe** da, **û** etwanin welami ew pîrsiyare bîdeyne-we ke elêt bo çi w çon dewleti **İsrail** biçkolane etwanîye xaki **Ereb** dagir bîkat, ke jumareyan le 153 milyon kes ziyatr e? Her weha le rûy hêzi abori w leşkeri nek her wek yek nin belkû ebûwawe **İsrail** le tîrsi hêzi zor **û** zebendî madi w beşeri dewletekani **Ereb**

nek fîzey lê nehataye, belkû her her be **dû-sê** rojek le ser xeritey siyasi **nawçeyê** nemabaye. Ke çi her carêk nextê le erzi **Ereb** dagir **eket û** istake xerike nek tenha hêzi çekdari **Felistinîyekan** le **nawbat** w bes. Belkû xaki **Lubnan** dagir **bîket û** **bîkate** koloni xwe i w her çi kesek boni pêşverû lê bê t le **nawibat?**

Bo welam danewrey em pîrsiyare pêwîst e temaşay xeritey siyasi **Rojhelati** **Nawerast** bîkey be **Kurdistanî** dagirkrawi ê mewe w dewletari **Ereb** le **Bakûri** **Efrika**. **Bîzînin** hêzaney **ke beşek in** le **bîzûtnewey** şoreşgêri cihani w ew hêzaney **ke beşek in** le **İmperyalizmî** **cihani** kên? **û** her yekayan ta çî **radeyek** de **selatdar û** be hêzin? **Radey** **pêgihîştin û** geşebûni w hawbeşiyi le nêwan **eman û** ewan da çon ne? **Komelgayi** gelani **Nawçeyê** çendê berew pêşewe çuwe w le çî **qonaxêki** **mêjûyi** da ye?

Em ro komelgayi gelani em **nawçeyê** **ejmêdrêt** be komelgayi du-

**wakewtûw**, rejimekani nawçeke ji britiye le koneperest û ser imperyalizm, çuwar dewleti Erebi ke nawiyan nawe be "Berey xoragir-tin û bergiri" le çawi ewanîtir da ejmêrdêrên be pêşkewtunxwaz û le kampi yekem da. Belam carê le piley rejimi burjuway niştiman in û rewîşt nasyonî in her çende le rû da hendêk cewazi haya le nêwaniyan da, yemêni xwarû nebêt ke têekoşê bo damezrandini komelgaya sosyalisti zanisti. Harikari nêwan em dewletana ziyatir şiklî ye, kemtir mebdêi ye, Le nêwan eman û hêzekani dikey bîzûtnewey şoreşgeri cihani her weha ye be pêçewaney emane rejime kawneperestekan harikari yektirî ziyatir eken. Lew cenge narewayey ke berpa buwa le nêwan Irak û İran dewlete koneperestekani Erebi hemû core harikari rejimî rewîşt faşistî Iraq eken ke çî harikari hêzi çekdari Felestini w pêşkewtunxwazi Lubnan nakin.

Bo çî serkirdey dewlete koneperestekani Erebi bem core rewîşt eken? Diyar e ke ewan û Îsrail dosti imperyalizm in. Çünke meslehetî çinayeti herdû layan lewe da ye ke dosti dewlete kan w imperyalizm bin. Bo ye bêbakin le nawbirdimî hêze şoreşgerani nawçeke w be taybetî hêzi çekdari Felestini w Lubnan. Melik Huseyin nek her yarmeti Felestiniyekani nedawe, belkû be ceng hêzi çekdari ewani derkid le virdan, sadati gor be gor û rejimî Mîsîr dijayetiyanî kird, rejimî seddam deryani kird le Iraq û tenanet destî xîste ser ew çek û tifaçey ke boyan ehat be rey xaki Iraqewe le hêzekani kampî bîzûtnewey şoreşgerî cihani w hundê endam û serkirdey pêşkewtûwî ewani şehid kir. Çend ciyabunewey bo durust kira le layen ew dewletanewe. Bo ye hiç seyr ni ye ke Îsrail bîbête cerdey xoşewistî imperyalizm le nawçeke û harikari karêgeraney lê wergirêt û kampi duwem be hêz bêt le nawçeke.

Be taybetî, ke hêzekani kampi yekem em ro ke sist w lawaz in. Bari çalakîyan û harikari le nêwaniyan da lew radeye da ni ye ke bitwanêt serkewtûwane beramberî em hêrişey hêzi koneperest û Imperyalizm bîwestêt û karêgerane berperçî bîdet.

Bo çî êstaka em rastiye heye ?

1- Komelgay Nawçeke duwakewtû we w hêze koneperestekani Nawçeke be harikari Imperyalizm cihani hemîşe koşîşî kirdiwe w dirêxi nekirdiwe lewey ke em nawçeyê her wa dakewtû bêt, le gîşt rûyekewa. Gîşt tuwanay xoyan bekarhênawe w ehênin bo serkût kirdini hemû core fikrêki pêşkewtunxwaz tenanet diji fikrî Birjuway Niştimani w netewayeti.

2- Dewleti Îsrail û sistemi dewletani Erebi, wekû bahs man kird, dosti Imperyalizm in. Yekemîyan le qonaxi damezrandini dewleti sermayedari da ye, duwemîyan hêştê le feodalizm û eşairî w sistemi komprador in.

4- Hindê şoreşî niştimani ke ke rûyda le nawçeke, le serata da dij be Imperyalizm bûn. Belam le ber ewey serkirdekani burjuway leşkerî w niştimani w dinî bûn. Le rewangeyî netewayeti w dinî teskewa hengawîyan ena w hengaw enên ew şorişana tûşî, rêzêk heley stratejî bûn û zorbeyan le encam da kewtine bawêşî Imperyalizm. Wekû Mîsîr, Iraq, Somal, Sûdan, Yemêni Bakûrî w Serkirdayetiye Şoreşkey Kurdîstani Iraq (1961 - 1975). Ewaneytir xerik in bikewne ew gomewa.

4- Hêz û bîzûtnewe siyasiyekani nawçeke bî gîştî ejmêrdêrên be beşek le bîzûtnewey şoreşgerî cihani, le astî fikrî w dirûşm û hengaw naneweyan û mewqût wergirtina le ser rûdawekani nawçeke. Heta ew part û rêxirawane jî ke ejmêrdêrên be parte pêşrewekani hawçeke nek harikari karêgerane niye, le nêwaniyan da belkû tûşî çendin ciya hûnewe w berberekani naw xwo w core w cor bûn û zor car meselekaniyan têkelaw kirdiwe w zor car dijimîni serekîyan le bir çûtewa ke Imperyalizmi Emerikî ye. Em rastiye ewa egeyênêt ke hêştê komelgay nawçeke diwakewtiwe w serkirdey bîzûtnewe siyasiyekan le destî birjuwa ye (birjuway heme çeşne).

5- Lem hêze siyasiyane, ewey le ser şanoy siyasi emroy nawçeke da bêt bîzûtnewey rîzgarixwazi niştimani geli Filistin e, û bîzûtnewey rîzgarixwazi niştimani w dimokrati geli Kurdîstan e.

Yekemîyan tuwanî hêlî parte

ciya ciyakani xwoy ko bîkatewe le yek bere da be nawi Rêxirawî Rîzgarî Filistin (PLO) û hêzi çekdari xwoy hebêt û rastewxwo beramber dijimîni rawestêt. Duwemîyan tuwanî rîzgarbêt le serkirdayeti koneperestî şoreşê pêşwekey, belam bedaxewe, carê berey rîzgarî niştimani ni ye w neytwanîwe hêlî parte ciya ciyakani xwoy ko bîkatewe le jêr programeki niştimani gîştî da, çî le her parçeyek, çî le seraserî Kurdîstan. Legel eme jî da bîzûtnewey rîzgarî niştimani w dimokrati Kurdîstan hêzi çekdari şoreşgerî xwoy he ye w berengari rejime koneperist û dagirkerani Kurdîstan bîwetewe.

Em du hêze emro bûwîn be gelay pêşkewtunxwazekani Nawçey Rojhilati Nawerast. Bo ye, Imperyalizm diji em du hêze ye w hewledat le nawiyan bîdet be hemû core w le hamû layekewe. Em rastiye jî emro zor diyar e.

6- Emro ke em du bîzûtneweyê w dostekaniyan le nawçeke le tenganedan û xerke şorişî Filistinîyekan le naw xwên da bîxinkênêrê, Kurdîstan jî wêran bîkîrê be serxelkekey da. Eme lew bawerdayn ke em rewşê wa namênêt û hêze pêşkewtunxwazekani nawçeke muracaykar û bari xwoyan êkin û têdigên le nîqte lawazekani xwoyan û helekaniyan û ziyatir pişt be yektirî ebest in, harikari şorişî Filistin û Kurdîstan êkin ke serkewtini gîşt layêkiyan bende be serkewtini em du şoriş e.

Em hêrişê durundaney Îsrail be ser Filistinî w Lubnaniyekan û em bê harikariyey serekdewletekani Erebi û mat bûniyan, her wa bê nîrx nabêt. Eme lew bawere dayn ke raperin û sorîş peyda ebên û çend rejimeki dêne gorin Kilimati siyasi em nawçeyê da ziyatir germ ebêt û çalaki şorişgerane berew pêşewe eçêt û têkoşani geli Kurdîstan roli ziyatir ebêt le xebati gelani nawçeke dij be Imperyalizm û sîyonizim û hêze koneperestekani Rojhilati Nawerast û geli Filistinî egate mafi xwo.

ZMANÊ XWE HÎN BIBE !



Beyrûd, dî nav agir de...



Beyrûd, dî dû bombên Îsrail re...

## Êrişên Îsrailê

Îsraila êrişkar, ji avabûna xwe vîr da, bî destê Amerika yekbûyî bû dewleteke kevnepereşt û xwinrij. Bî deh hezaran Fîlistîni bî van êrişan hatin kuştin û bî deh hezaran jî welatê xwe hatin kîrîn.

Dî 6 ê Heziranê da Îsrail careke din Lubnanê vegirt û bîndest kîr, 30 hezar Lubnanî û Fîlistîni kuşt an birindar kîr. 600-700 hezar kes bê war û mal man. Kampên Fîlistîniyan yeka-yek hatin bombe kîrîn. Îro, Îsrail, dora Beyrûdê girtiye û dixwaze leşkerên Fîlistîniyan bî serokên wan ve bî carek jî navê rake. Jî alîkî ve jî bajêr bombe dike.

Dî vê êrişê da Fîlistîniyan, bê hejmar mirov

û çek wînda kîrîn. Lî gor Îsrail 5 hezar Fîlistîni dî destê wan da esîrîn. Tê zanîn ku îşkence û hovîtiyên wek Naziyên Eleman lî wan dikir, ew jî li gelê Fîlistîne dikin. Lê belê, vî şerî ne bî tenê gelê Fîlistîne û Lubnanê perişan kîr, Îsrail bî xwe jî, gelek leşker û serleşker wînda kîr. Van hejmarên jêrin ku me jî çend kovaran girtiye netîca êrişê Îsrail kêm-zêde dî de xuyakîrîn.

Jî Îsrail 5 hezar kes hatin kuştin û birindar kîrîn. Bî sedan jî aliyê Fîlistîniyan va hat esîr kîrîn. Îsrail bî devê xwe dibêje ku, 237 tank, 10 balafirên şer, 6 helikopterên wan hatine xîstîn.

Dî êrişê Îsrail a yekem

da lî El-Reşadiyê, 41 serleşkerên Îsrail hatin kuştin. Dî êrişê duwem da jî, 4 general hatin kuştin. Alîkarê serokê leşkerî yê giştî jî dî nava wan da bû. 164 serleşkerên bî nişanên bilind û 224 serleşkerên din jî hatin kuştin. Îsrail bî xwe dibêje ku dî şerên El-Reşadiyê da 600 kes wînda kîriye. 3 balefirên Îsrailê, termên (laşên) xwe û 14 jî birindarên xwe dibîrîn.

Jî aliyê din ve jî lî Îsrail % i30 bihabûn çêbû û % i 2 çamçûr hat zêde kîrîn. Rûmeta perê Îsrailê jî % i 3 kêm bû. Lî hember vê dijwariya jiyana giştî jî % i 6,3 zêde bû.

Jî ber van sedeman jî lî Îsrailê bî deh hezaran kes lî dijî şerîn. Ev êrişê

Îsrailê bî xwestin û alîkariya Amerika yekbûyî pêkhat û xîzmeta kevnepereştî û şerxwaziyê dike. Dewleta Îsrail ya siyonîst, plan û daxwazên Amerika yekbûyî lî Rojhilata navîn bî cih tîne.

Disan dî vê êrişê da 9 balefir, 23 ezmanparêzên SAM-6 firaçaki topên Sûriyê jî aliyê Îsrailê ve hatin tahrib kîrîn. Îsrail û Amerika dixwazin hêzên Fîlistîni jî bajarê Beyrûdê derkîn. Bî vê armançê, rojên dawîn, gelek êrişên xwînî birin ser qereregeh û malên Fîlistîniyan. Lî gor rojnaman, milê radikal ê tevgera Fîlistîni naxwaze bajêr biterê kîne. Dî vî şerê dawîn da jî bî sedan Fîlistîni şehîd bûne.

Leşkerên Îsrail

Kesên Sivil

ji

Esir Dîgirtin



## Nûçeyên Kurdistana Iraqê

### SULEYMANIYE:

Dî 9 ê çileyê de, hukûmetê, bo çêkirina merasimekê gel li hev ciwand. Ev merasim bo birêkirina leşkerên Iraqê bû, ku diçûn şerê Iranê. Ji nişke ve, ev merasim guheri û bû tevgerê li dij rejimê û sloganên "bimre rejima Saddam" dest pêkirin. Leşkerên hukûmatê êriş bîrî ser gel û bî sedan jin û mêr hatin girtin. Li dij vê hovitiyê, xwendekarên xwendegeha keçan, ji bo azadkirina hevalên xwe dest bi protestoyê kirin. Leşkeran êrişê wan ji kîrî û gelek hoviti bî wan kirin. Gelek keçan hatin lêdan û ji aliyê leşkeran ve kotek xwarin.

Ev bûyer û tevgerên girsî paşê li her derê Kurdistanê belav bûn û şiklê serhildaneke gîştî girtin.

Li Suleymaniye ji 23 yê Nisanê heta 28 ê Ni-

sanê bûyereke nu pêkhat, leşkeran 4 xwendekar ji xwendegeha "Watan" kuştin.

Li Kerkukê ji tevgerê gelêrî ji 3 Gulanê heta 6 ê Gulanê dom kir û xwe bi hêzên Tirkmenan re ji têkiliyên xwe xurt kirin.

Li Koyê, di 4 ê Nisanê de, meşek destpêkir û leşkeran 3 kesan kuştin. Yek ji wan xortekî bî navê Dilzate Tewfik bû.

Li Bakreco, Helebca, Qaladiza, Ranya, Çarqurne û li gûndên mezînan ev bûyer û meş hin ji berdevam e. Li gor nûçeyên nu, li bajarên Dihokê û Mûsilê ji protestoyên mezînan girsî dest pêkirine.

Di sala 1982 an de miting û meşên mezînan li dij rejimê Saddam ya xwînrijî pêkhatin. Li Kurdistana Iraqê, gelê Kurd, li her bajari dest bi miting û

meşên protestoyê kir. Bajarekî ku tê de miting girsî pêkhatin ev in:

### QALADIZA:

Di 24 ê Nisanê da, li Qaladiza, meşeke girsî bo biranina 8 saliya çetli-ama Saddam Hesen El Bekir pêkhat. Di vê çetliamê de 93 kes hatibûn kuştin û 200 kes ji birindar bûbûn. Gelek kes bo vê biraninê ber bi gortana bajarê meşiyên drûşmên "ji Iraqê re demokrasi, ji Kurdistanê re otonomiya rast" avêtin.

Lê, leşkerên hukûmetê gule li ser gel barandin. 9 kes hatin kuştin. Ji wan du kes bî navê, Sanober Mahmut (mamos-te) û Emine Sor (jin) bûn.

Pîştî vê êrişê, gelê bajarê dest bi karberdanê kir. Gelê Qaladiza yê

qehreman, niha ji karberdanê didomine.

Hêzên hukûmetê û xulamên wan, bî balefiran êriş bîrî ser gel û nehiştin birindar di nexweşxanê de tedawi bibin. Lê ev hovitiya dijmin hêza gel neşikand.

### ERBİL:

Gelê bajarê Erbilê di roja 31 ê Adarê de bî têkiliya 10 hezar kesan dest bi tevgerê dij rejimê kir. "Ji Iraqê re demokrasi û ji Kurdistanê re otonomiya rast" û dij tengzarkirina Kurdan drûşm hatin avêtin.

Leşkerên hukûmetê êrişê wan kirin û 2 kes ji nav wan girtin û li wê derê dan ber gulana. Yek ji wan Erbilî û yê din Mawedi bû.

### INTERNASYONALA SOSYALIST CÛNTA TIRKIYÊ PROTESTO KIR

Buroya Internasyonala Sosyalist, li ser rewşa Tirkîyê bîyareki girt. Ev biryar, bî kurtî weha ye:

Tirkîyê, bî darê zorê û bî awaki lez û bez mafên mirovî ji navê rakir. Bî belavkirina parlamentoyê û sendiqan, karûbarên siyasi ji bîni ve rawestand. Em, bî dileki şikestî qedexekirina çap û weşanan ji dibînin.

Dozên politik yênan ku di dadgehan de tînan domandin, birinên kûr vedikin. Ew awûqatên ku dozên diparêzin, ji wan re pingar derdixin. Em, wek tore pejirandina daxwazên bî dar-

dekirinê protesto dikin.

Girtina serokwezîrê kevn Bulent Ecevit, hincirandina li ser wî û ji nûcar ve girtina wî ji bo birandina dengê wî ye.

Komisyona mafên mirovî li Ewrûpayê û hinek letên endam di konseyê Ewrûpayê de, divê pîrsa lêdanê û binlingkirina mafên mirovî binin rojdemê û piştigiriya wê bikin.

Em bî awaki gelemperî, destkişandina politikavanên kevn ji jiyana politikayê û domandina rejimê han protesto dikin.

Em bala we dikşînim, bir-

yara 765' an, ya ku di roja 28 / 1 / 1982' an de li Koseya Ewrûpayê, di derheqê Tirkîyê de hatibû girtin û di rewşa Tirkîyê ya îroyin de, ji destûr û rêbaza Konseyê re çewt dikeve, her weha, girtina partiyên siyasi û dest danina ser malên wan.

Disan em bala we dikşînin wê biryara ku di roja 13' ê Gulanê 1981 ê de, di derheqê dirêjkirina endametiya delegasyona Tirkîya ku di parlamentoya Ewrûpayê de hat girtin. Di san em piştigiriya guruba sosyalist, ya ku di parlamentoya Ewrûpayê da ye, dikin û ji bo ku PAZARA

HEVBER (pazara mişte-) rek) alikariya xwe ji Tirkîyê re bîde sekmandin, em vê serilê xîstina gurûba sosyalist di cih de dibînin. Heta ku demokrasiya parlementerî ya gelenperî û hemû prensibên himçaxiyê, mafên politik û sendiqayî neyên wejandin, em nedayina alikariyê destek dikin. Em bala dewletên ku bî Tirkîyê re hevkarîyên ji bo alikariya dualî hene dikşînin, divê alikariyên xwe ji Tirkîyê re kêman bikin. Internasyonala Sosyalist, ji van dewletan re nîya PAZARA HEVBER ya Ewrûpayê, ya ku girtiye tewsiye dike.

## PIRSNAMA OSWALD SÖDERQWIST

PIRSNAMA OSWALD SÖDERQWIST, PARLAMENTERÊ VPK (PARTIYA KOMUNIST), JI  
OLA ULLSTEN (WEZIRÊ KAR Û BARÊN DERVE YÊ SWÊDÊ) RE, DERHEQ ZORDESTIYA  
LI SER EQELIYETA KURD LI TIRKIYÊ Û SÛRIYÊ

Dî rewşa iro de, zordestiya cûnta leşkeri ya Tirk li hember her babetê berberiyê (mîxalefetê) baş tê te zanin. Ji aliyê Swêdê ve, rêxistin û kesên serbixwe aktiv xebitine ku zilma li hember endamên sendikan û mîxalifên siyasi derxînin der û bîdî xuyakirin. Hukûmeta Swêdê piştî dudiliyekê, li dij cûnta leşkeri rawestiya û weki dî ji vê pîrsa han ani Konseya Ewrûpayê.

Lî dervayê zordestiya ku cûntayên min vê di çarçeweke gîştî de dîkin, di mesela Tirkîyê de tadekariya li dijî gelê Kurd ji heye. Ji hêla Swêdê ve, li ser vê pîrsa han, li gor rewşa Tirkîyê ya tevayî, li ser Tirkîyê kêr hatîye lê kîrî û bala gel nehatiye kîşandin. Disan ji Kurd li Tirkîyê ji hin komên dî bê tîr zîlmê dibînin. Sedemên vê, yê nî mîjûyî (tarixî) hene, lê weki dî ji sedemê vê yekê ev e; ku Kurd pîr caran ji yê nî dî bê tîr û aktivîr beşdari tîkoşîna li dijî cûnta leşkeri dîbin. Îro li Tirkîyê, dema ku derheq mîxalifên girtî, dardekîrên "terorîst" û kesên siyasi ku di bî çavdêriyê de ne, tî tî kîrî û peyîvî, her çend di nûçeyan de raste rast derbas nebe jî, pîr caran di derheqê Kurdan de ye. Ev, bî taybetî jî bo heremên Rojhelata Tirkîyê -ku heremên Kurdan in- wulo ye. Li van hereman, Kurd ne ku di hindikayîyê de ne, ew, pîraniya rûniştewanan pêktînin.

Eve jî mîj ve ye, rînd tî te zanin ku bî destên cûnta leşkeri, tadekariyêke mezî li bajarê Diyarbekrê domdîke. Li gor kaniyên resmî, yê nî kirdayetiye, li Diyarbekrê, heta meha Sîbatê, ya sala 1982-an 160.000 kes bo îfade dayîne hatîne girtî. Bî hezaran kes hin jî girtî ne.

Ji van kesan, jî bo 400 - 500-i jî cezên grîtan tî xwestî. Dadgeha (mahkema) cûnta leşkeri, jî bo 162 kesan hukmê kuştîne duxwaze. Parastîna van gîrtîyan, li gor usûlê ne mîmkun e, jî ber ku parêzerên (ewûqatên) ku dawî dîgrî jî tî girtî û tade dibînin.

Dî 21'ê Adara îsal de, li girtîgeha leşkeri ya Diyarbekrê

rê, dest bî çetliamekê hate kîrî. Leşkeran agir berdan girtîyan û li dor 40 kesî, mîrov hate kuştî. Bî her aliyê xwe ve hin mesele ne zelal e, lê 13 kuştî dane merîvên wan, yê nî ku dîkarîbûn bî pera cendekên xwe bîkîrî. Rabestîna cûnta leşkeri ya Tirkîyê, di vê meselê da û yê nî min vana da, sîceki dij her babet azadî û mafên mîrovîyê ye.

Em, derheq eqelîyeta Kurd, li Sûriyê û tadekariya ku lê tî kîrî jî, dîkarî bî jî ku hukûmeta Swêdê, şê la xwe ya rexnegîrî li dijî Tirkîyê di vê meselê de neparastîye. Ev, jî çîkûziya ku Swêdê li hember multeciyan Kurd yê nî Sûriyê şani dîde, bî awakî vekîrî vedîxuyê. Malûmatên ku derheqê Kurdên Sûriyê de hatîne dayî çewt in. Li gor van malûmatan Kurdên Sûriyê ne di bî zordariyê de ne. Swêdê jî, bîyarên xwe, yê nî derheqê Kurdên Sûriyê de li gor van Malûmatan daye û hînek Kurdan jî Swêdê deraniye. Kurd, çawa li dewletên dî tî hîncîqandî, li Sûriyê jî jî aliyên aborî, çandî û zîman ve wulo tî hîncîqandî û mafên wan tî qut kîrî.

Dîvê hukûmeta Swêdê, şertên eqelîyeta Kurd li Sûriyê, jî nî zîk ve analîz bîke û şê la xwe i derheqê mafên wan î iltîcayê û mayîna li Swêdê bîguhêre. Gelek rewşên bî serê xwe hene, ku jî nî ve di çav re derbas kîrîna wan pê wîst e.

Lew re, ez dîxwazîm jî wezîrê kar û barên derve bîpîrsîm:

1- Hukûmeta Swêdê, derheq çetliama 21'ê Adara 1982'an li Diyarbekrê, çî raporî an malûmatan wer-girtîye?

2- Wezîrê kar û barên derve amade ye, ku li dijî vê çetliamê, bo pêkanîna protestoyê navnetewî bîxebite?

3- Wezîrê kar û barên derve amade ye, ku bî mînasebeta protestoyên gîştî li dijî cûnta leşkeri ya Tirkîyê, doza Kurd tî xe rojevê?

4- Nîhêrîna wezîrê kar û barên derve derheqê Kurdên Sûriyê çî ye?

OSWALD SÖDERQWIST

### NORWEÇÊ, TIRKIYÊ JI DADGEHA MAFÊN MIROVÎ RE GILÎ KIR

Wek tî zanî û biranî, jî vê rewşê bîxî. Kîrdeyatî-demeke dîrêj ve ye ku ya Norweçê mîze kîr, ku pênc (5) dewletên Rojava bî zanîyarî dîxwazî vî do-dîxwestî Tirkîyê bîdî zê veşîrî û paxpaxbîkî. Dadgeha Mafên Mîrovî. Lê, jî ber vî yekê kîrdeyatîya çend dewletên Skandinaw-Norweçê, bî serê xwe, ya di vî wî de xwe sîst cûnta Tirkîyê da dadgeha girtî û xwestî, ku pî nî Mafên Mîrovî.

Îcar, pê wîst e, ku kîrdeyatîya Tirkîyê, bî dereng-tîrî di nav 3 heftan de xwe di sariyên Dadgeha Mafên Mîrovî de bîparêze. Lê cûnta û kîrdeyatîya wî ya hefsarkêş, jî bo ku di sariyên navnetewî

de hesap nede, her meto-di bî kar tîne. Ji van meto-dan yek jî ev e, ku cûnta û kîrdeyatîya cûntayê dîx-waze xwe jî sariya Wezîran ya Konseya Ewrûpayê jî bo demekî kurt vekîşîne.

## DI PANELA 3'YÊ GULANÊ DE KI ÇI GOT

Dı roja, 3 Gulanê 1982'an de Federasyona Komeleên Kurdistan bî hin parti û rexistinên siyasi yê n Swêd re, lı ser rewşa Kurdistanê panelek çêkır. Dı vê panelê de ji Partiya Sosyal Demokrat, endamê parlamento û nûnera Konseya Ew-rûpayê Anita Gradin, ji Partiya Komunista Çep Oswald Söderkvist, ji Partiya liberal (gel) Mikail Uddevall, ji xaça sor Börje Sjökvist, ji rêxistina Efuya Navnetewi liqê Swêd Elizabet Bergström, ji konfederasyona sendiqên Karkeran (LO) Hans Fågelström, amade bûn.

Bê şik meseleki giring e ku doza gelê me lı Swêd, dı navbera parti û rêxistinên mezın û yê n siyasi de tê mınaqêşe kırın. Û weki dın ji ev gaveki ji bo yekitiya Kurdan û prestija federasyona me ye.

Panelê du seet berdewam kır, dı seeta pêşin de hevalek ji federasyonê tevi wan endamên parti û rêxistinên Swêdi lı ser rewşa Kurdistanê ditinên xwe gotın. Dı seeta diduyan de, endamên van parti û rêxistinên bersivên guhdaran dan.

Dı panelê de nêziki 300 kes hazır bûn. Pirsên guhdaran û bersivên wan em ê dı hejmara ku bê bınivisın. Niha em ê ditin û axaftinên wan endam û nunerên parti û rêxistinên Swêdi lı ser Kurdistanê pêşkêşi we, xwendevanên xwe, bıkın.

**ANITA GRADIN:**

(parlamentera Partiya Sosyal Demokrat û nênera Swêd lı Konseya Ew-rûpayê)

Ez, nunera Konseya Ewropa - yê me. Ev zordestiya ku lı ser gelê Kurd tê kırın, ez, dı xebata xwe ya Konseya Ew-rûpayê de hin bûm. Wek tê zanin, gelê Kurd lı wan welatên, ku mafên mirovi tên pelçiqandın dıji. Yek ji wan welatan endamê Konseya Ew-rûpayê ye. Ew ji Tirkiye ye.

Hun ji bı çandi mın bı rewşa Tirkiye ya pişti 12 İlona 1980'an

dızanın. Tışteki gelek vekiri ye, ku iro lı Tirkiye zordestike gelek mezın lı ser gelê Kurd heye. Wek dı raporên Rêxistina Efuya Navnetewi de (Amnesty International) tê qal kırın, gelê Kurd ji eşkencan tê derbas kırın. Gelê Kurd, ji ber ku mafên xwe yê n mirovi tê pelçiqandın û ji bo vê ji delil û şahid henın.

Zordestiya lı ser gelê Kurd, bı Cûnta Leşkeri re nahat, ev zordesti berê ji hebû. Em sosyal demokrat, divê her dem bêjin, ku ji bo vergerandına demokrasiyê

lı Tirkiye divê Kurd û Tırk bı hev ra kar bıkın û iro ev pêwist e. Pişti helkırına doza demokrasiyê lı Tirkiye meselên dın tene helkırın. Heya Cûnta Leşkeri lı ser hukum be tıstek hel nabe. Heya niha, em Swêdi, dı Konseya Ew-rûpayê de ciyê Tirkiye eşareta pırsê datinın û tevi Norveç, Danimar kayê û Hollandayê em ê Tirkiye bıdın dadıgeha (mahkema) mafên mirovi û bı vi awayi em karın tepkiyên xwe bıdın nişandın, ji bo tıstên ku lı Tirkiye tén kırın. Mın dı axaftına xwe de qala Tirkiye kır, ji ber ku ez, ji rewşa Tirkiye agahdar im.

**OSWALD SÖDERKVIST- VPK** (nunerê Partiya çep a Komunist, Parlamenter)

Ez bı we re me, ku dı çapinên Swêd û Ew-rûpayê de lı ser rewşa gelê Kurd hindik tê nivisandın. Ez gelek kêfxweş bûm ku we, ev panel çêkır. Bı xêra xebatên we Kurdan hinek tê qal kırın. Ji bo doza gelê Kurd firehtır bibe û ji aliyê gelê Swêd ve bête bihistın û rêxistinên siyasi berpısiyar in. Bo doza gelê Kurd zêdetır aktuel bibe, partiya me pırsê bırbû parlamentoyê. Dı vê dawiyê de tıstên lı Kurdistanê dıbin, dozê zêdetır aktuel dıkın. Dı vir de ez qala hatına Cûnta Leşkeri lı Tirkiye û şerê nav İnan û İraqê dıkım, ku gelê Kurd dı navbera van herdu sinoran de hedef e.

Jı bo em, doza gelê Kurd zêde aktuel bıkın dı dest me de sedem hene. Cûnta Leşkeri raste-rast gelê Kurd hedef gırtiye. Bı navê partiya me ez soz dıdım, ku em ê doza gelê Kurd zêdetır aktuel bıkın û dı nav parti û rexistinên me de lı ser doza gelê Kurd bıpeyvın.

**MİKAIL UDDEVALL-**

(Bı navê Partiya Liberal, sekreterê partiye yê Enternasyonal.)

Gelê Kurd ji wek hinek gelên dın, ji mafên xwe yê n netewi bê par e. Tucar mafê ditina xwe eşkera kırın, komele danin û pêşvebirına zıman û çandi, nayên piçûk ditin. Gelê Kurd, dı navbera tekoşına hêzên xurt de hatiye pelçiqandın. Ji ber ku mirov ji aliyê siyasi, oli, nijadi û etnik de dı bın zordestiyê de nemının, em bı hemû hêzên xwe dıxebıtın ku vê rewşa han mehkûm bıkın. Ji bo gelê Kurd bıgıhije mafên xwe yê n mirovi, mafê xwe yê çare nûsi bı dest bıxe, em tu car bê deng naminın û em ê rexnên xwe bıgırın.

**BÖRJE SJÖKVIST:** (Şefê Xaça Sor, yê Beşa Multeciyan)

Bê teref bûn, bıngêhê xebata Xaça Sor a Navnetewi ye. Ji berê de ji bo xaça sor vekiri ye ku gelê Kurd hewceyê mirovi ye û ev gelek giring e. Bı bir û baweriya mın dıxtorên Swêdi dıkarın gelek tıştan ji bo alikariya gelê Kurd bıkın. Lê belê, alikariya navnetewi bı hıkümetên der dor re bı rewşek baş û peymanê, xebat dıxwaze. Hêzên ku bı mere dı nav dubendiye de ne, bı me re xebatê napejirinın û ji bo vê yekê alikariya xaça sor nagıhije ci. Gelek caran alikariyên me dıçın destên hinekên dın. İnan û İraq, ketine nav şereki dirêj. Tirkiye bı Cûnta Leşkeri ve ketiye nav rawşeke nu û gelek tedbiran gırtiye, ji bo ku gelê Kurd alikariyê nestine. Ji ber van awayan imkanên alikariyê hema hema ji navê hatine rakırın. Ji bo ku xaça sor im-



## BEŞDARÊN PANELÊ :

SAP : PARTIYA S. DEMOKRAT  
 FP : PARTIYA LIBERAL  
 CP : PARTIYA MERKEZÎ  
 VPK : PARTIYA KOMUNIST  
 LO : MERKEZA SENDIQAN  
 AMNESTY INTERNATIONAL  
 XAÇA SOR



Ninerên rêxistin û partiyên Swêdî dî Panelê de

kanên alikariyê bî destê xwe bighine ci, pêwîst e, ku bî van hikûmetan re dan û stendin bike.

Xaça sor a Navnetewî hatiye rawêşker wîsa, ku pêwîst e kampê nî girtîyan û girtîgehê zîyaret bike, û jî girtîyên siyasî re xwedî derkeve. Alikariyên ku xaça sor bîde gelê Kurd ketîye bî zordestîke gelek dijwar û gelek mirov welatê xwe berdane û revîne. Em dîzanin, ku dî girtîgehê de gelek Kurd hene û raporên îşkencan dîkevî destê me. Pêwîst e, ku em siyaseteke camêr bajon, ku van insanên siyasî qebûl bikin jî bo ku em karibin Kurdeki jî Swêd vegezinin pêwîst e dî destê me de garanti hebî, ku ev meriv dê îşkence nebîne an jî nekeve girtîgehê, û jî aliyê dî de mîlîteyî siyasî bigihîjin jî û zaroyê xwe.

**ELİZABET BERGSTRÖM:**

(pîspora Rojhelata Navîn, Amnesty International)

Ez, nûnerê Rêxistina Efu ya Navnetewî jî liqê Swêd im. Bîgehê xebata me li gor mafên mirovatiya Koma Mîletan ya sala 1948'an e. Li hember alikariya me jî bo gelê Kurd hînek pingar hene. Gelê Kurd: eçeliyeteki bîndest e. Rêxistina me bî doza eçeliyetan mîjûl nabe û weki dî jî gelê Kurd gurûbek mîlîtan e. Lê pêwîst e, ku em bî awakî alikariya gelê Kurd bikin, lê belê, xebata me jî bo alikariyê hêsan nîne.

Mesela, li Îran û Iraqê dî navbera Kurdan û leşkerên hikûmatê de şer heye, jî ber vê lazîm e ku em xebata xwe dî nav çarçevê de berdewam bikin. Mesela dî şerê politik de li Kurdistanê Kurd hatî girtî, îşkence dîtin, an hatî darvekirin û em li hember van tîştan bê deng neman û me wan protesto kir. Me mafê parêzer (ebûkat) yê nî girtî yê nî Kurd parast, li hember rawêş û jîyana pis ya girtîgehê derketî.

Zordestiya ku li Îran, Iraq, Tirkiye û li Sûriyê, li ser gelê Kurd tê kirin li gel van hikûmetan hat protesto kirin. Zêdetirîn li Iraq û Tirkiyê.

Em karî girtîyê siyasî adopte (jî girtîgehê derînin û binî Swêd) bikin. Jî bo vê jî şertên me ew in, ku ew kes teror bikarnanibî. Sala çûyî, me heft Kurdan adopte kir. Bî vê rîyê wek gurûp, bî girtîyan re pêwendî çê dîbe. Em jî bo parêzer (ebûkat) alikariya maliyê nî girtîya û bî rawêş girtîgehê re mîjûl dîbî û hikûmetan protesto dîkin.

**HANS FAGELSTRÖM:**

Nînerê LO (Konfederasyona Sendiqeyên Karkerên Swêd-Beşa Enternasyonal)

Ez, bî awakî pasîf hatîm vê civînê, jî ber ku min dîxwest dî derheqê Kurdan da hînek tîşt hin bî-

bîm. Paş ku ez jî rêyek dîr û dirêj vegeziyam min dî ku navê min dî lista qîsedaran de bû û ez hînek tîrsiyam jî ber ku ez li ser Kurdan nezan bûm.

Pêwîst e ku em vekirî qebûl bikin ku rêxistina me dî derheqê Kurdan de tewreki xwe yê vekirî nîne û em tucar li ser vê dozê nepeyvîne. Jî ber ku ev doz, pîrsek siyasî ye, ev, karên partiyên siyasî ne.

Lê belê, ez li ser rawêşa sendiqeyên yê nî Tirk û Kurd agahdar im. Min vê rawêşa xwe ya han jî wan hevayîyên ku vê panelê hazîr kirîbî re got, lê belê, disan xwestî, ku ez dîtinê xwe bêjim.

LO (Konfederasyona Sendiqeyên Karkeran li Swêd) bî hovîti heqê nî demokratîk û sendîke qedexekirî nî li Tirkiyê, protesto kir. Ev du sal in, ku Cûnta Leşkerî, bî naye "mîcadele li dijî terorîzmê" vê zordestiyê dajo. Bî teybetî zordestiya wan li ser serokên sendiqan bala meriv dîkîşîne. Ev li dijî yekîtiya karkeran ya navnetewî ye, ku Tirkiye jî bî nî vî peymanê îmze kirîye.

Awê ku em dîbihîzîm li ser serokên sendiqan zordestîke gelek mezan heye. Yê nî ku îşkence dîbinî û dî îşkencan de hatîne kuştî em navê wan dîzanî. Heya niha me nêzîkî 200 hezar kron jî girtîyan û maliyê nî wan re alikariya şandîye.

## PANELA SISIYÊ GULANÊ

Û

## GIRANIYA XEBATA FEDERASYONÊ

Mem Dîmîli

Roja 3'yê Gulanê, li bajarê Stokholmê, ji bo Kurdên li Swêdê disan wek rojê germ û bi tevger dest pê kir. Kurdên ronakbir, welatparêz û pêşverû, li ser konferansa Kurdistanê beri vê rojê di nav xwe de gelek peyivibûn. Disan di nav Kurdan de aktiviteyê ke germ û geş dest pê kiribû. Gelek kesan meraq dikirin. Gelek kesan li ser girîngiya xebatên wisan ditînen xwe belav kirin. Gelek kesan ji hev û du dîpîrsin. Gelo, ev konferans dê çawan derbas bibe? Dê serbîkeve yan na?

Kurdên li Swêdê, bi rasti ji wek gurubeke biyani gelek aktif in. Hem ji aliyê siyasî û hem ji aliyê civakî de, Kurd ji hev û du haydar in. Xeberek piçûk pîr zû belav dibe. Ev xebera konferansê ji bi vi awayî di nav Kurdan de belav bûbû. Ji ber ku ev xebata ha ji bo me Kurdan, wek xebateke pêşin bû, armanc û netica konferansê ji aliyê gelek kesan de ne kîş bû.

Lê ji aliyê federasyonê de, hem armanc û hem ji kê m û zêde netica civinê kîş bû.

Roja konferansê, piraniya Kurdên ku li bajarê Stokholmê û salayê dijîn, beri destpêka konferansê, yek bi yek hatin salona civinê.

Di derveyî salonê de pêşxistinê li ser Kurdistanê vebûbû. Kovar û rojnameyên kurdî, swêdî û zîmanê din dihatin firotin. Di hundirê salonê de hewake cidî û bêdengiyek hîşyar hebû. Di nivê salonê de maseke dirêj, mezî û 7 sandalye hebûn. 7 mirov rûniştibûn. Yek ji van Kurd, wek ninerê federasyonê, yê nî jî hemû swêdî bûn. Ji wan her yek yan partiye-

kê siyasî yan ji rexistîneke mirovperver temsil dikirin. wek: li ser navê Sosyal-demokratên Swêdê, SAP, Anita Gradin (endama parlamentoya Swêdê û endama konseya ewrûpayê), li ser navê partiya çep ya koministan, VPK, Oswald Söderqvist (endama parlamentoya Swêdê) li ser navê partiya gel, FP, Michael Udevalle, (sekreterê navnetewî), li ser navê konfederasyona sendikayên karkerên Swêdê, LO, Hans Fogelström (ji beşa navnetewî), li ser navê Xeça Sor, RODA KORS, -Borje Sjöqvist, (şefa beşa multecian) û li ser navê Amnesty International, Rêxistina Navnetewî ya lêborinê, Elizabeth Berkström (pispora Rojhilata Navin).

Federasyona Komelên Kurdistanê ji bo hazirkirina konferansê inisiyatîf girtibû, û ji bo vê xebatê ji gelek danûstandin bi radyo-TV û rojnameyên Swêdiyan re çêkiribûn. Ji 200 kesan zêdetir guhdar di civinê de beşdar bûn. Pirani Kurd bûn, lê gelek kesên Swêdî û biyani ji di vi konferansê de beşdar bûn. Konferansê du seat ajot. Hevalek ji seroktiya federasyonê civin idare dikir. Vi hevalî di vekirina civinê de axaftîneke kurt li ser rewşa 4 perçên Kurdistanê kir û informasyon da mêvanan. Di vê axaftinê de li ser bûyerên li hepisxana Diyarbekirê gelek hate sekînan, qetliama Diyarbekirê hate teşîr kirin.

Her ninerê partiyan ji rêxistinêkê, bi dor, biqasî 10 daqîqan bir û baweriyên organizasyona xwe pêşkeşî guhdaran kir. Piştî van axaftinan, dor hate ser pîrsiyarên guhdaran. Hemû kesên ku di ci-

vinê de beşdar bûbûn, mafên wan yê nî pîrsiyaran hebûn. Gelek pîrsiyar hatin pîrsin û ji aliyê nineran ve ji bersiv hatin dan. Pîrsiyarên herî zêde ji ninerên Sosyal-demokratên û Komunistan hatin pîrsin.

Konferans bi awakî tevayî gelek baş derbas bû. Ji aliyê dîzan û disiplinê de qet kêmasî tune bû. Hemû kesên guhdar bê ku biwestin, nêzîkî 2 seatan li salonê rûniştin û qet acîz ne bûn. Ji aliyê bejdarbûnek fire ya ninerên organizasyonên Swêdiyan de ji, civin gelek bi serketî bû.

### GAVEKE HÊJA Û GIRÎNG

Beri ku em derbasi armanc û netica konferansê bibin, pê wîst e ku em piçêkê behsa van partiyan siyasî û rêxistinên mirovperver bikin. Ev organizasyon hemû di civata Swêdê de bi çî awayî temsîl dibin? Di nav civatê de tesîrên wan çi qas in? Cihê wan di civata Swêdê de çî ne?

Ger em ji Sosyal-demokratên dest pê bikin, rewşa wan iroj di civata Swêdê de ev e: Sosyal-demokratên Swêdê wek hêzeke siyasî, nêzîkî 40 salan li ser hikûmetê mane. Civata Swêdê şiklê xwe yê iroj di bin Îqtidara Sosyal-demokratên de wergirtiye. Di nav civatê de nufûza wan gelek e. Her çiqasî iroj ne di iqtidarê de ne ji, tesîra wan hin gelek mezî e. Di nav gel de giraniya wan heye. Di gel gelhemperiya xwe wek hêzeke dijî faşîzmê xuyani dikin. Li hember rejimên leşkerî yan ji faşîst, dixebîtin. Li hember rejimên faşîst, gelek caran alikarî û pişgiriya hêzên demokrat û pêşverû kirine.

Partiya çep ya komunist, VPK, di civata Swêdê de wek hêzeke

pêşverû dî parlamentova Swêdê de komîstên (çepên) Swêd temsil dikin. Yek ji 5 partiyên parlamentoyê ye. Giraniya vê partiyê ji dî civatê de, kê m û zê de, heye. Wek partiyeke çep diji rejimên kevneperest û kedxwar dîsekîmî, alîkariya tevgerên pêşverû û demokratîk dikin.

Konfederasyona Sendikayên Karkerên Swêdê, LO, bî milyon û niv endamên xwe ve dî nav civata Swêd de ciheki gelek grîng werdigire, Hêza wê, gelek caran, bî çasiya hîkumetê heye. Rêxistinêke rûniştî ye û dî civatê de giraniya wê gelek e.

Partiya Gel, FP, partiyeke liberal e û hin ji dî koalîsyona hîkumeta Swêdê de beşdar e. Wek partiyeke iqtidarê dî warê xwe de xwedî gotin e.

Xaça Sor û Amnesty Internatîonal, wek pîraniya xwendevanên me dîzanî, rêxistinên mirovperwer in û hem li hundirê Swêdê û hem ji aliyê navnetewî de rola wan gelek mezin e.

Armanca vê konferansê ev bû: mesela Kurdan bî awaki resmî, vekirî dî gel hêzên siyasî û mirovperwer yê Swêdê aktîvalîze bike. Jî bo legalîzebûna mesela Kurd rêve . Bala parti û rêxistinên mirovperwer bîkşîne, dî vi wari de mîneqêşe veke.

Divê em bî wan re jî danûstandin bîkî. Mesela Kurdan dî nav Sosyal-demokratîkên Ewrûpayê de legalîze bîkî. Bî kê manî bîla alîkariya neyarê me nekî û wek meselên xelqên dî pîştgîriya mesela Kurdan jî bîkî. em dîkarîm nîmûnan hin zêdetîr bîkî, lê ne hewce ye. Bî kurtî xwestîna me ev e, ku divê em danûstandîneke xurt, bî awaki fireh û bî hemû rêxistinên demokratîk û mirovperwer re bîkî.

## XEBATA FEDERASYONA SWÊDÊ DÎ VI WARÎ DE DESTPÊK E

Me dî hejmara yekan de behsa grîngiya federasyonê bî nîvîsareke dirêj ve kiribû. Lê ev hin destpeka xebatê ye. Gelek tîşt hene ku hin merov newêre wana aktîvalîze bike û behsa wan bike. Gelek gav û xebat dî pêş me da hene. Pîraniya van xebat û gavan dî esasa de ne karê federasyonê ne. Gelek jî van karan, karên hêzên siyasî ne. Jî

ber ku danûstandîna siyasî pîr caran iroj dî programa rojê de ye. Federasyon li Swêdê bes xebata demokratîk û mirovperwerî dîke.

Ev konferansa yek jî van xebatan e. Divê em bî awaki cîdî û zana dî vê rîyê de dom bîkî. Wek nînerê VPK- partiya komîst- jî dî civînê de behskîr: "pêkanîna civîneke wîsan bî partiyên cuda û rêxistinên mirovperwer, jî bo xebata gelê Kurdistanê, gaveke gelek grîng e, Jî ber ku ev konferansa cara yekemîn pêk tê û resmî ye". Em jî bî gotînen Oswald re ne. Bî rasti jî wîsan e. Dî vi wari de valahîyeke gelek mezin heye, heta iroj ev valahîya mezin bî xebateke hêja tîje nebûye. Em naxwazîm bîkevîn mîneqêşa vê, lê bes divê em gelekî heydar bîm.

Em netîca vê konferansê gelek çenc û baş dîbînin. Bî kê manî van organîzasyonan hemû bî awaki resmî mesela Kurd mîneqêşe kîrî, hemû bêguman: qebûl kîrî, ku Kurd neteweyek bî serê xwe ye, Îroj dî bî nîrên gelek dijwar da dîjî, mafên wan yê mirovî û demokratîk jî wan hatîye standî. Dîsan hemû yan qebûl kîrî ku, divê Kurd wek mîletêke mafê xwe yê demokratîk, netewî û mirovî bîstîne, jî bî zîlm û zorîyê derkeve. Jî bo nîmûne, Amnesty û Xaça Sor dî konferansê de bî awaki resmî soz dan ku alîkariya grîtyên siyasî û multecîyan Kurdan bîkî.

Pîştî vê konferansê, tîştêk êdî vekirî û eşkere ye, ku jî bo aktîvalîzekîrîna mesela Kurdan, ev konferans ne bes e, divê gelek civînên dî jî çêbîbî.

Dîbe ku xwendevanên kovara me ya Berbangê, vê foruma ha zêde grîng û hêja nebin. Dîbe ku vê bûyerê wek xebereke piçûk û normal bîxwîn û dî ser re derbas bî. Lê bî rasti wexta merov bala xwe baş bîdê, ev ne wîsan e. Bo çî ne wîsan e, em dîxwazîm vê babetê piçêkê vekî:

Em hemû dîzanîm ku tîkoşîna gelê Kurdistanê bî sedsalan dî bî hesîran û dî paş derîyan de ma ye. Opînyona (efkari ûmûmî) derveyî welat meseleya gelê Kurdistanê bî awaki rast û baş ne grîtîne destên xwe. Her tîm û dîm meseleyên Kurdistanê hatîne kêleka meseleyeka dî ya civakî yan siyasî. Bî awaki resmî tu car li ser meseleyên

Kurdistanê nehatîye seknandî. Hertîm ew yek jî meseleyên Tîrkîyê, Iraçê, Suriyê yan jî Iranê hatîye behs kîrî. Wek meseleke dî hundîrê van dewletan de hatîye tîgîştî. Ev rastiya bî 10 salan li pêşîya tîkoşîna gelê Kurd bûye pingar. Meseleyên Kurdistanê bî awaki serbîxwe nehatîne nîvîsandî an jî behs kîrî. Ev tîşt jî sedî sed ne wîsan be jî, pîr caran wîsan bûye. Lê van salên dawî êdî nû meseleyên Kurdisatanê bî awaki cîdî û serbîxwe hîm caran dî hînek kovar û weşanê nîvîyanan de hatîne behs kîrî. Ev tîr nake. Dîbe meseleyên Kurdistanê jî wek meseleyên dî yan yê cîhanê, bî awaki cîdî û resmî bê kebûl kîrî.

Resmî bûyîna van tîştan dî nav xwe de gelek grîngî nîşan dîde. Heta nîha pîr parti û rêxistinên mirovperwer, li ser Kurdan û li ser Kurdistanê car-caran dîvîsînin an meselê aktîvalîze dikî, gelek caran bî awaki ne resmî dikî. Jî resmî beyan û îzahîan dîtîrsî. Cavên wan tîrsîyane. Divê em vi tîştî jî bîni de bîşkînin. Wan mecbûrî îzaha resmî bîkî. Hemû danûstandînen xwe bî awaki resmî bîkî ku bîla wan wek rêxistin an jî partiyên siyasî grîde bîde. Wexta dîtin û axaftînen wan li ser Kurdistanê bî awaki resmî eşkere bûn, ew zû bî zû nîkarîm dev jê berdî.

Ya nokta dudan ku gelek grîng e, ev e: Heta nîha kes an jî hêzên Kurdistanê danûstandînen xwe bî bîyanîyan re gelek bî sinor û teng kîrî. Ev tîşt jî ne rast e. Divê danûstandîm gelek fireh be. Bî hemû hêzên demokratîk, pêşverû rêxistinên mirovperwer û hwd. danûstandîm şert e.

Amnesty International, wek rêxîsteneke mirovperwer alîkariya grîtyên siyasî dîke. Jî aliyê awûkat, pere, doktor û îmkânên xwe jî bo grîtyên siyasî seferber dîke. Her wîsan Xaça Sor, wek rêxîstîneke multecîyan, gelek îmkânên wê hene. Jî kesên multecîyan re alîkariya mirovperwerî dikî, mafên wan dî organên navnetewî de dîparêzîm. Her wîsan partiyên sosyal-demokratîk hemû welatên kapitalîst jî aliyê îmkân û danûstandîne ve gelek pêşde ne. Jî aliyê tîsîrkîrîna dergehên ragîhandîne (Wek Radyo-TV û rojname) û tîsîrkîrîna organên navnetewî de îmkânên wan pîr xurt in.

## Demokrateki

### Militan :

## İSMAİL BEŞİKÇİ

OR. K.



Dı bingehê de hesabırsina ji şowenizmê li Tirkîyê, hesabırsina ji Kemalîzmê ye. Kemalîzm, navê netewegriya (nasyonalîzma) netewa stemdar e. Felsefa pêstûran (zalman) e. Kemalîzm, ideolojiya dewleta Tirk i ku navgîna (we-sita) zordari û bandêriya (hakimiyeta) birjîwazîyê Tirk e. Û ji aliyê dewletê ve, dı hemû beşên (berên) cıvatê de, wek ideolojiya dewletekê hatîye bî cih kîrîn û bî damezrani-vexîstî (mîesese kîrîn).

Dı pêkhatîna (avayîya) Kemalîzmê de, yek ji xusûsiyetên herî girîng, anti-kurdîzm e. Yanî Kemalîzm, li ser inkara bûyereke (waqî-ake) cıvaki ava bûye. Li gor wê, "her kesê ku li Tirkîyê diji, Tirk e ji ber Tirk bûyîna xwe bextewar e. Tu netewek bî navê 'Kurd' û tu zîmanek bî navê 'kurdi' ni ne. Kurd, Tirkên çiyayî ne. Kurdi, zaravakî tirkî i xîrabûyî ye."

Ji destpêka 60 salên mejûya komarê (tarîxa cumhûriyetê) vîr ve, unîversîten Tirkîyan, van ramanan raçandîne û belav kîrîne. Li ber ideolojiya resmî, mîna kolan stûyên xwe xwar kîrîne. Înkare bî damezrani-vexîstîne û derewê anîne rewşa siyaseteke dewletê. Li hember ideolojiya resmî ya dewletê i

dij-zanîstî, dij-demokrati û înkarker, ji unîversîtan xwedîyê rexna yekem û bitenê İsmail Beşikçi ye. Lew re dı bî tu hoyan de ji İsmail Beşikçi re nehatiye tehemul kîrîn. Tîm xwestîne ku dengê wî bî darê zorê bîdîrî birandî. İmkanên xebata wî ya zanîstî ji destên wî girtîne û wî mahkûmê birçîbûn û betaliyê kîrîne. Bî van tîştan ji çîma xwe nanîne, li diji wî dawê li dû dawê vekîrîne, bî salan dı girtîgehî de hiştîne û bî deh salan ceza-yê nî grînan danê.

Bê guman, pîrs ne tenê bî birandîna dengê xebatkarekî zanîstîyê ve sinorkîrî. Bî berlê girtîna xebatên li diji ideolojiya resmî ve ji sinorkîrî ni ne. Ji ber ku jîyan rastîya xebatên Beşikçi bî sistem û mîsêwa aşkere dîke. Hebûna Kurd i ku ideolojiya resmî wê tune dîhesîbine û zanîstîyar û unîversîte ji bo peyîtandîna (îsbat kîrîna) tunebûna wê dîxebîtin, ji aliyê cıvaki ve, û ew çend ji ji aliyê siyasî ve xwe aşkere dîke û derewkeriya ideolojiya resmî tîne rastê... Lew re pîrs, dı planê serxwebûna welatekî û azadiya netewekê de himdar dîbe. Li hember wê yekê, derbendên (barajên) paşerû, yê ku bî destên dewletê hatîne avakîrîn, xwe ranagîrîn, dîterîkî û dîfelîşîrîn...

Xebatên Beşikçi, yê nî pêşî, dı salên 60'î de xuya kîrîn. Lê kolîna wî ya ji bo teza doktrîyê, Eşîreta Elikan î koçer, Guherîna li rojhelat û pîrsên struktûrel, Analîza Mîrtîngên Rojhelat û dawîyê ji xebata wî ya fîreh, bî navê Pergala (sîstema) Rojhelatê Anadolê, Bingehên cvak-aborî (sosyo-ekonomîk) û Etnîk, hatîne weşandî. Ev xebat, hî xebatên wulo ku bîkarîbîrî çalîbên ideolojiya resmî bîterîkîrîne nebûn. Beşikçi pêçîya xwe danîbû ser pîrsên ku ideolojiya resmî wek tabû dîhesîband, lê dı ramanên wî de hî guherînen bîngehî ne bûbûn. Dı 1971'î de, li ser gîliyê (ixbara) çend profesoren unîversîta Erzeromê, hate girtî û li Diyarbekrê, dı mahkema gerandîna awarte (îdara orfî) de hate mahkeme kîrîn. Dı ramanên Beşikçi de ev dem, dema werguherînen bîngehî e. Ev werguherînen bîngehî, dê dawîyê, dı xebata wî ya bî navê "Metodê ilm" de vexuyên.

Beşikçi, dı mahkemên Diyarbekrê de 13 sal û 7 meh ceza xwar. Bî bexşandîna 1974' an ji girtîgehê derket. Lê wî careke dî bernedan unîversîte. Xebatên xwe wek nîvîskarekî domand. Pîrtûkên wî ji aliyê weşanxana Komalê ve hatîne weşandî. Ev pîr-

# İSMAİL BEŞİKÇİ

## Kİ YE

*Kurdi : E. Zêrin*

Ismail Beşikçi dî sala 1939 da, li qeza İskilipê, ya bajarê Çorumê hate dînê. Zaningeha (fakulte) zanyariya siyasi qedand. Lî Bedlîsê û Hakariyê leşkeriya xwe kîr. Lî zaningeha Atatürk, ya lî bajarê Erzeromê dest bî karê asistaniyê kîr. Dî sala 1967 da doktora xwe qedand û bû doktorê sosyolojiyê. Jî ber sedemên lêkirîna pirtûka xwe ya 'Pergala Rojhîlata Anadolê/ Bingehên Sosyo-Ekonomik û etnik' jî vi kari hate avêtin. Dî sala 1971 da, li Zaningeha Zanyariya Siyasi ya Enqerê dest bî kar kîr. Dî vê navê da hate girtin. Jî ber sedemên pirtûkên ku lêkirîbûn û dersên ku dabûn, Dadgehên (mahkemên) Dagera Awarte yê Diyarbekrê 13 sal û 7 roj hukum (ceze) danê. Wi jî girtigeha Diyarbekrê rakirin ya Eddenê. Dî sala 1974 da, bî efuya tevayî (gelemperi) jî girtigehê hate berdan.

Pîştî ku jî girtigehê hate berdan, rê ne dan wi ku dest bî karê xwe yê berê bike. Destûr ne danê ku xebatên xwe berdewam bike. Jî alîki va tadeyên polis, jî aliyê dîm va jî, jî hêla abori, xwestin wi dî nav çarçewek teng da bihêlin. Dî vê navberê da, pirtûkên ku wi lêkirîbûn jî aliyê çapxana Komal hatin çapkirin. Tevaya van pirtûkan hatin berhevkirin û derheq wi de dawê vekirin.

Jî van dawan ya yekemin li Stembolê, dî dadgeha asli ya çapa - gîştî da qediya û Beşikçi 2 sal û 12 meh ceze xwar.

Dî 3'ê Îlona 1980 da, jî girtigeha Stembol-Topkapiyê rakirin girtigeha Adapazarê û 23'ê Sîbata 1980 da jî, jî vir rakirin, bîrin girtigeha Kaynarçê. Dema ku wi jî ciheki radikirin ciheki dîm, tazi dikirin û dixistin bin falaçê. Dest da



*Ismail Beşikçi xebata xwe ya zanîstî dî zindanê de jî didomîne*

nin ser destnîvisar, pirtûk û tîştên wi yê bî vi rengi. Beşikçi dî 12'ê Nisana 1980 da cezayê xwe qedand û jî girtigeha Kaynarçê hate berdan.

Jî bo pirtûkên ku lêkirîbûn hatibû girtin û vê bûyera han lî der û dorê dînê tesîrek mezîm berdabû. Kargerên rêxîstina (Emnesty International), Yekîtiya Nivîskarên Îsvîçrê, Swêd, Norwêc û Hollandê çî bî devoki, çî jî bî nîvis, serokkomarê wê demê, Fahri Korutürk û serokwezîr Suleyman Demirel protesto kirin. Beşikçi jî, jî her yekê van rêxîstînan ra nameyek bersîvi şand.

Dema Beşikçi jî girtigeha Adapazarê rakirin ya Kaynarçê, ev nameyên protestoyê ku jî wi ra jî hatibûn birêkirin û bersîva hin nameyên ku wi dabûn, hin parçên ku jî rojnaman qutkirîbûn, pirtûk û tîştên wi yê minî van ne dikarîbû bî xwe ra bibe. Dûra lî girtigehê saxkirînekê kirin behana û ev tîştana spartin Femandariya Deryavanê (Donanmê) û Dagera Awarte. Femandariyê, hin nameyên ku dî

nav vê pakê tê da bûn û weki dîm jî nameyek berdest ku jî serokê Yekîtiya Nivîskarên Îsvîçre mirza Mousse ra hatibû nîvisandin wek delîlê sûc numand û xwest ku derheq wi lê pîrsinek bê kirin.

jî ber vê yekê, dî 19'ê Hezîrana 1981 de girtin ser mala Beşikçi, ya lî taxa Ankara/Etlîk û jî hêla polisê siyasi ve ket bin çavdêriyê. Sê rojan lî şûba siyasi ya Berpîrsiyariya emniyeta Enqerê pîrs jê hatin kirin. Jî wêder wi şandin 'qîşla Sakaryê'. Pîştî ku 42 rojan dî bin çavdêriyê da ma, dî 30'ê meha Tirmehê da girtin û xîstî 'Girtigeha Kocali-Seyman'ê. Dadgehê, dî 20'ê Îlona 1981 da destpêkir û dî 23'ê Adara 1982 da qediya. Beşikçi jî ber nameya ku jî Mirza Mousse ra lêkirîbû û bî vê, kirîna sucên wek 'qedr û qîmetê Devletî Tîrk şîkandin, nijadperestî, parvexwestin û hwd.' 10 sal hîkmê gîran xwar.



## Nama Ku 10 Sal Ceza Xwar

Nameya ku ji Mirza Boulanger ra di 14-08-1980- da hatibû birêkirin û di girtigehê da bîdestketibû û wek delilê sûc hatibû şanidan, tevaya wê weha ye:

'Lı Tırkiye ideolojiya resmi her weha bî inad inkara netewa Kurd û zımanê kurdi didomine..Ev ideolojiya ha ku em dikanın bêjin Kemalizm e, yek ji bingehê xwe lı ser dij- Kurdayetiyê ave kiriye. Nijadperest û metingehparêz e. Ev ideolojiya resmi bî zaningeha tirk, organên dadigehi, partiyên siyasi û navginên danûstandinê yên girseyi wek çap, radyo û telewizyonê va hatiye pejirandin (qebûl-kirin).

Dı vê pêvajoyê da her babet navginên ideolojik yên zordeş û zordayinê hatine bikaranin û tên bikaranin.

Zanigehên ku dibên xweser in, organên dadimendiyê yên tê iddikirin ku serbixwe ne, navginên danûstandinên girseyi ku dibên azadın û sazendên ku xasme dibên demokratik in, vê ideolojiya han bêgotın qebûl kirine. Ev sazendên han, her ku diçe dikevın dirûvê avaker (çêker) û belavkirên vê ide-

olojiya resmi ya kû lı ser bingehê derewan hatiye avakirin.. Ew bûne sazendên heri girıngtır yên vê ideolojiya resmi ku lı ser bingehê derewan hatiye avakirin. Sendika Niviskarên Tırkiye ya ku ez endamê wê me, ew ji sazendeke 'demokratik'e. Lê belê tewrên lı gor ideolojiya resmi bı peş va dıbe.

Jı ber vê yekê, ramana Tirk lı gor du qaliban peş va diçe.. Niviskarên Tirk yên demokrat ji, tewrê wan bı komunisti ji dinavinin, lı gor du qaliban dıfıkırın..

Evana bı tevgerên rızgarixwaz yên lı derekê Dinê kêfxweş û dıřa dıbin. Pesnê wan tevgeran didın. Mıldariya (Pıřtgir iya) xwe raber dıkin. Lê tevger a rızgarixwaz, lı kijan cihê Kurdistanê dıbe, bı tewrek dijminayeti lê dinêrin. Pıçûk dıbinın. Dıbêjin dı vê da tılıya emperyalizmê heye û bı çaveki xırab (nebaş) lê dinêrin.

Lı Tırkiyê navendên (derdorên) ku derheq mafên mirovantiyê kar dıkin û komelên ku mafên mirovantiyê diparêzın û pêş va dıbin hene.. Lê vana heta nuha derheq

pıřsa Kurdistan û mafên mirovên Kurd qet tu tewır pêş na nebirine.. Jı gotina tıřteki ki kanıbe bıkêri Kurdan bê, jê misoger dır dikevın. Lê heta ji wan tê, pesna ideolojiya resmi dıdın. Ev rıxistinên weha, bona ku pıřsa Kurd nebinın, dı nav keftûlefek (karûbarek) bı inad û zanısti da ne. Ú dı bin van hoyan da dewleta Tirk zordariya xwe ya nijadperest û metingehparêzi bı hêsayi didomine. van zordestiyên xwe yên nijadperest û metingehkari kiriye siyaseta rojana.

Beramber vê siyaseta nijadperest û metingehkari, tew dewleta Tirk idia dike ku ew ji mafên mirovantiyê ra hurmet digre. Tew dıbêje ez yek ji wan Dewletên yekane me lı dinê ku ji mafên mirovantiyê ra hurmetê we heye. Derheq vê da lı ser rawestına du bûyerên ku van rojên dawın qewımıne fêde heye.

Emnesty International (Rexistina Navnetewi ya Bexşinê) lı Tırkiyê derheq lêdanên dı girtigehan da û rabestınên diji mafên mirovantiyê raporek weşandiye. Berpırsyarên (karbidestên) Dewleta Tırkiyê dij idiyên Emnesty Inter-

national derdikevin. Mesela wezîrê kar û barên hindur Mustafa Gûlcûgûl (yê wê çaxê) kane bîbêje ku 'Tirkiye ji wan welatên yekan e ye ku hurmetdarê mafên mirovanti yê (li rojnamên Tirk yên tarîxa 18.06.1980 binihêre). Wezîrê kar û barên derva Hayrettin Erkmen ji dîsa di tarîxa 23.06.1980'an da dikani bû eyni tiştên di gotarek (meqale) ku di kovara 'NEWSWEEK' da bi dirav (peran) hatibû weşandin da bîbêje. Lê çapa Tirk, himber rapora Emnesty International bêdeng ma. Beramber pîrsa Kurdistan û mafên mirovantiya Kurdan, Tew idiyên ku karbidestên Dewletê pêşkêş dikin qet nake pîrs (mesele).

Derdorên zaningehan, partiyên siyasî, sendika, komele, navgînên girseyî yên danûstandîne û her weha yên mina van qet destê xwe navêjin pîrsa Kurdistanê. Piştî Serê Yekemin yê Cihanê, bi teybetî di navbera salên 1919-1923'an da parvekirin û perçekirina Kurdistan û pîrsên wek li ser netewa Kurd bikaranina siyaseta parvek-dagerin, pîrsên ku derdorên zanyariya Tirk û ramana Tirk bi kefteleftek teybetî naxwaze bibîne û lêbikole

Çapa Tirk, derheq pîrsa Kurdistan bê pîvan bêdeng e. Lê ev bê-

dengiya ha, bi hesab û kitab e û rabestînek bi zanistî ye. Armanç, kesên ku bi pîrsa Kurdistan dadikevin tenê hiştin e. Kar û bar dike, da ku tesîra bir û baweriyên di wî wari da bişkîne, mesela, nama protesto ya ku rêxistina we di tarîxa 3'ê Çarîya Paşin, 1979'an da ji serokomar Fahri Korutürk û serokwezîr Süleyman Demirel ra birêkîrbû, di çapa Tirkiyê da demeki dûr û dirêj cih ne girt. Ancax, di tarîxa 15'ê gulanê 1980'an da, di rojname 'Demokrat' da wek xeberêk piçûk hatibû lêkirin. Disan ji eyni karbidestên Dewletê ra nivîsarên ku di tarîxa 10'ê Çeleya pêşin, 1979'an da hatibûn birêkîrin û tê da dijheviya zordariyên ku li Kurdan tînin kirin û mafên mirovantiyê hatibû lêkirin, di çapê da qet cih ne girt. Çapa Tirk, bê guman, di derheq meselên din da weha ne bêdeng e.

Zordestiyên ku ji hêla Dewletê tê domandin bê guman kelemeki mezin e di rîya pêşketina raman û zanyariyê da. Bêdeng mayina sazandên wek çap, sendika, zaningeh û girêdayî vi serê xwe ji van zordariyan, ra hejandina wan dilbe sedemê zedetirinkirina Ev ji rastiyeq mezin e. Tevaya van dîde xuyakirin ku mesele ji azadiya nivîskareki bêtir, meseleke din

e. Mesele, MESELA AZADIYA NETEWA KURD E. Û iro Kurdistan di nava rojhilata navîn da mêtîngeheke navnetewî ye û hemû mafên wê yên netewî û demokratîk ji dest hatiye standin, hatiye parçekirin û parvekirin. Netewa Kurd neteweke ku bi tîlên risî û erdên mayinan hatiye parçekirin û jîbo jihevketina wê xebat tê kirin.

Di vê rewşê da statuya siyasî ya netewa Kurd ji metîngehiyê hin nizimtir e. Ji ber, mesela hebûna netewe Kurd li Tirkiyê nayê pejirandin (qebûlkirin). Kurd li Tirkiyê çiqas bibîh Tirk û çiqas Kurdteyîtiya xwe înkâr bikin ewqes ji mafên wan yên tevayî (gîştî) heye. Yan na zordestî, zulm, zindan...

Jiber van sedeman, himber meselên weha mirov çiqas giraniya meselê ji azadiya nivîskareki bêtir, bi de hêla azadiya neteweki ewqas pîr çê ye. Ez dixwazim diyar bikim kupesnê nameyên rêxistina we jiber van awayan tê dayin.

Dervayî van hamûyan, serokê hêja, bo agahdariya teybetî ya şanidayina şexsê min, ez ji we û tevaya endamên rêxistina we silav û sipasî ên xwe bi rê dikim. Jindari, dîşayî û serfiraziya we dixwazim."

## PIRTÛKEN İSMAİL BEŞİKÇİ

Xebatên Beşikçi yên dema yekemin bi navên Eşîreta Elikan ya Koçer Li Rojhilatê (Kurdistan Tirkiyê), Guhartin û Pîrsên Avahiyê, di nav Eşîretên Kurd yên Koçer da Guhartina Cîvaki, Lêkolîna Mitingên Rojhilatê û Pergala Rojhilata Anadolê Bîngehên Cîvaborî (Sosyo-Ekonomik) û Etnik, hatine weşandin.

Xebatên Beşikçi yên duemin ji evana ne:

1- Ji hêla Xweserbûna Zaningeha Azîna Zanyariyê û Bîngehên Demokratîk yên Cîvakê

İSMAİL BEŞİKÇİ 1: çapxana Komal weşandîye û tê da dokumên tevaya dawên Dîyarbekîrê he-

2- Azîna Zanyariyê: di vê pirtûkê da, Beşikçi li ser pîrsa azîna zanyariyê dişkîne, rexne li Kemalîzmê û kîrîmên wê dike. Lêkolînen derheq diroka Tirkiyê ya de-

mên dawin ku, dê wek rêzeke li ser bê rawestî, çarçewa wê ya teorîk tê dayin.

3-Azîna Zanyariya li Tirkiyê Bikaranîn 1, Bi zorê Bîcîhkîrîna Kurdan rexne li Kemalîzmê tê girtin. Di salên 1934'an da li ser zagonên ku bi zorê Kurd bi cîh û war karanina van zagonan, xebatên ku di destpekê da bo vê hatine kirin û bê wezîfa kesên zanyar di van xebatan da çî bûn, tê peyîvin. Li ser bîngehê dewleta Tirk ya nijadperest û şoven û li Kurdistan kîrîmên wê yên mêtîngehkarî tê peyîvin. Ev pirtûka han hate berhevkirin û Beşikçi salek û şeş meh ceza xwar.

4- Azîna Zanyariyê li Tirkiyê Bikaranîn 2, "Teza Tirk û Dîrok", "Teoriya Ro-Zîman" û Pîrsa Kurd: ev pirtûka han di salên 1930'an da xebatên di warê dirokê û zîmên da hatine kirin, diruvê van xeba-

tên nijadperest û şoven, idiyên dervayî Zanyariyê û kîrîmên wan, înkâr û mêtîngehkarîya ku dewleta Tirk wek siyaseta li ser Kurdistanê bikartîne, dîde raberkirin. Ji bo vê pirtûkê Beşikçi sê sal ceza xwar.

5-Azîna Zanyariya li Tirkiyê Bikaranîn 3, Rêbaz û destûra Firqa Komara Gel (1927) û pîrsa Kurd: Beşikçi, li dokumenta siyasî ya ku di dema yek partiyîyê û yek serokiyê da herî giringtir bû û ji zagona bîngehin hin granbuhatîr bû, rexne dike. Beşikçi di vê pirtûkê da bersîva 41 kesên zanyar dîde û dîtînen wan yên çewt û hewl pûç dike. U bi navê hîlbîjartîmê dek û dolabên ku hatibûn kirin, bi şex û seyîdan ra pêwendiyên Kemalîstan û siyaseta dewleta Tirkiyê ya derheq Kurdistanê, radîweste. Ev pirtûk hate berhewkirin. Bo vê pirtûke dawê ji Beşikçi ra nehat vekirin. Lê derheq berpîrsyarê be-

## Jinên Kurd Dî Konferansa Navnetewî De

Dî navbera 10-12'ê Gulana 1982 an de, li bajarê Stockholmê Konferansa Jinên Bîyaniyan hat li dar xistin. Pêkanina vê Konferansa Navnetewî ya Jinên Bîyaniyan, di diroka dewleta Swêdê de ji cara yekemîn bû. Ev Konferansa Navnetewî ya Jinên Bîyaniyan jî aliyê Komela Jinên Bîyaniyan (RIFF) ve hatî bû organize kirin.

Jî hemû dewletên Ewrûpayê yê kapitalist ninerên rêxistinên jinên bîyaniyan di konferansê de beşdar bûn. Jî bilî ninerên rêxistinên jinên bîyaniyan li ewrûpayê, gelek berpirsyarên meqamên dewletên Ewrûpayê û kesên pîspor jî di konferansê de amade bûn û li ser mijara jinên bîyaniyan, bir û baweriyên xwe pêşkêşî konferansê kirin.

Konferans bi axaftina wezira bîyaniyan ya dewleta Swêdê Karin Andersson, hat vekirin. Parlementera Swêdê û endama komisyona Ewrûpayê ya macirên ciwarbûyî Anita Gradin jî, axaftneke dirêj kir. Xwedîya malê û sereka Komela Jinên Bîyaniyan li Swêdê (RIFFI) Mira Kakossaios, jê bo perwerdekirina jinên bîyaniyan, raporek pêşkêşî konferansê kir.

Roja 11'ê Gulanê jî Universita Osloyê Hedda Giertsen, di derheqê civîna di navbera dadgehên Norveçê û bîyaniyan de raporek da konferansê.

Dî konferansa Navnetewî ya Jinên bîyaniyan de yek jî beşên ku bal kişand panel bû. Mijana panel, li ser rewşa jinên bîyaniyan, mafên wan yê xebatê, civaki û malbatî bûn. Ew kesên ku di panelê de beşdar bûn ev in: Prof. Anna Christenssen, Lund, Brita Sundberg-Weitman û awûkat Monica Wernstedt. Panel jî aliyê van kesan ve hate gerandin.

Konferansa Navnetewî ya jinên bîyaniyan sê rojan li dû hev dom kir. Dî konferans û bî taybetî di panelê de li ser rewşa jinên bîyaniyan pirtîşt hatin gotin. Lê, em, dikarin bi tenê, bi çend hevokan (cîm-



Wêşek ji konferansa jinan ya navnetewî

lan) rewşa konferansê bîdî diyar kirin:

Jina jinên bîyaniyan li Ewrûpayê gelek dijwar derbas dibe. Zîman, kultur, ol û toreyên bîyaniyan tesirên neyînî û nebaş li jinên bîyaniyan dîkin. Pîraniya jinên bîyaniyan yê ku li Ewrûpayê ne jî gundan hatinexwendin û nîvîsandina wan tune. A yek, jin jî bo ku jin e, a dîdiwan jî, jî ber ku ew bîyaniyan ye, zîlm û tade lê dibe. Jinên bîyaniyan, jî jinên din bê tir karên giran û dijwar dîkin. Pîraniya wan rojê 12 saetan dixebitin û destmîzeke pîr hindîk dîgrin. Dî warê bêkariyê de jî jinên bîyaniyan seri dîkîşinin. Ewlekarîyên wan yê civaki kêm in: nexweşî û li zarokan mîzekirin di nav problemên wan yê herî mezin de ne.

Jî roja destpêka konferansa Navnetewî ya jinên bîyaniyan yan nînera Komela Jinên Kurdan li Swêdê jî, di konferansê de heta dawî beşdar bû. Nînera Komela Jinên Kurd li Swêdê, di konferansê de axaftnek kir. Wê di axaftina xwe de, rewşa Kurdistanê û ya jinên Kurdistanê diyar kir. Nînera Komela Jinên Kurdan li Swêdê roja dawî

jî, jî bo protestokirina rejîma Iraqê û Tirkiyê pêşneyarnameke pêşkêşî konferansê kir. Ew pêşneyarname di nav pêşneyarnameyên giştî de hat pejrandin (qebûl kirin). Konferansê biryara şandina vê nîma protestoyê wergirt. Em pêşneyarname ku jî aliyê Komela Jinên Kurdan li Swêdê ve jî konferansa navnetewî ya Jinên bîyaniyan re hatibû pêşkêşî kirin û di konferansê de hatibû pejrandin li vê jêrê pêşkêşî xwendevanên xwe dîkin.

**BIRYAREN KU DI 10-12 Ê GULANA 1982 AN DE LI STOCKHOLMÊ, DI KONFERANSA NAVNETEWÎ YA JINÊN BIYANIYAN DE HATIBU WERGIRTIN**

Li Kurdistanê kapitalîzm bi kedxwarîyê hatiye honandin û jî her alî ve jinan re pelçiqandin û hincirandinê tine. Jî zarokên me re azadiya Kurdan ne tiştê e. Ew bi tenê kedxwarîya xwe dixwazin.

Li Tirkiyê, li Îranê, li Iraqê û li Sûriyê pêwîst e, ku mîr û jin bi hev re li dîji kevneperestîyê û pelçiqandina netewî, tîkoşînê geş bikin.

Van welatên xwinrêj li Tirkiyê û



Iraq, mêr û jinên Kurd davêjin  
girtigehan û işkence dîkin.  
Van metodên han ji bo endamên  
grubên şoreşger yê nînin ji bî kar  
tinin. Dijmîn yek e, lê grani û pî-  
raniya tadê li ser jinan ne.

Lî Iraqê rejîma dîktatori, bî he-  
zaran malbatên Kurd, tengazar kîr  
û ew jî cihên wan dan barkirin. Jî  
bakûr şandin başûra Iraqê. Dîxwa-  
zîna Kurdan asimilê bîkin an jî bî-  
kujî. Rejîm naxwaze Kurd pêş-  
kevî û pêş ve herî. Jî ber vê ye-  
kê dîxwazî, çaxa Kurd hîn dî zî-  
kê dîya xwe de ne bîkujî. Bî zorê  
dermanê zarokneanîne-thallîm- dî-

dî jinên Kurdan

Lî Tirkîyê dî roja 12'ê Îlona  
1980 an de, bî alîkarîya Amerîka-  
ya Yekbûyî cunteke leşkerî hikû-  
met xîst bin destên xwe. Dî girtî-  
gehên Tirkîyê de, îro bî hezaran  
jun û mêr benda cezayên xwe yê nî-  
mîrîne ne. Îsal dî roja 21'ê Avdarê  
de cunta Tirkî ya leşkerî, dî girtî-  
geha Dîyarbekîrê de 6 kes jî girtî-  
yên Kurdan kuştî.

Jinên Kurdan dî bin tede û zîlma  
cuntayê de tî nî pelçîqandî. Leş-  
ker û polis erîşan dîbin ser mêrên  
Kurdan û malên wan. Lî ber çavên  
zarokan lî jinan dîxî. Mal û xanî-

yan dîşewtinî, mîrovan tazi û bîr-  
çî dîhêlî. Ev rewş jî bo jinên Tîr-  
kîyê pîr dîjwar e.

Em Komela Jinên Kurdan lî  
Swêdê, jî ber van tîştan banî we  
dîkî û jî we dîxwazî, ku ev kon-  
ferans rejîmên lî Tirkîyê, Iraq û  
Îranê yê nî ku tade û zîlm lî gelê  
Kurd û bî taybetî lî jinên Kurdan  
dîkî, protesto bîkî.

-Bîla bîjî tevgera jinan ya navne-  
tewî '

-Bîla bîjî alîkarî û pîştîgirtîya nav-  
netewî '

Komela Jinên Kurdan lî Swêdê

HELBEST

### GORI SERBAZÎ WIN

Ke wefdê dîçête şwênê  
Bo ser gori Serbazi Win  
Tace gulîneyek dênê

Eger sibey  
Wefdê bête wulati mîn  
Lem bîpîrsê:  
"- Kwanê gori Serbazi Win?"  
Delêm:  
"- Gewrem !

Le kenarî her cogeyê,  
Le ser sekoy her mîzgewtê,  
Le ber dergay  
Her malê, her kenîseyê, her eşkewtê,  
Le ser zînarî her şaxê,  
Le ser dîrextî her baxê,  
Le Kurdistan,  
Le ser her bîste zemînê,  
Le jêr her geze asmanê,  
Metîrse ! Kemêk ser daxew  
Tace gulînekê danê !

A.P.

### KULMEK EVÎN

M. Ferzend Baran.

I  
Wek stranên wê  
Wek govendên wê  
Wek şerên wê  
Evîndar îm, evîndar îm jî wê ra jî

II  
Dî her şefaqa sar ya sibê da  
Dîqîrîm, evîna mîn evîna mîn  
Lê  
Lî dûr, lî dûr e evîndar

III  
Tenê bû evîndar, jî sedsalan vîr ve  
Westîyayî bû evîndar, jî derdan vîr ve  
Lê bîla ne hata guhê wê hejîna dengêkî jêhat  
Lî ser piya bû dîsa, nebîxêrê

IV  
Pariyek evîn hebû destê mîn da  
Mîn dîxwest dînyayek avakîm jî vê  
Bo evîndaran

V  
Mîn dîgot, evîna mîn mîrîn tune  
Ez dîzanîm, eger hîn jî ne mîrî me dû hewqas tîştî  
- mîrîn tune--  
Lê birneke, çûyîne da bigre bî xwe ra rext, feraq û dilê mîn  
Hatîne da bîne bî xwe ra gulek sor, dîgot wê

VI  
Gumîna şerê hîrmîz û ehremen bû lî ser pêşîrên serîmîj  
Reş reş tirên evîne bû lî ser lîvên naşît  
Nalîna sebra mûsa bû nav çavên balûpal  
Bî kurtî, afat bû, afat bû ew

tûk hatin berhevkirin. Beşikçi, ji nû ve hat girtin û cezayên têvel xwar.

Beşikçi di van xebatên xwe de, li aliyên siyasi, yê nê mêjûya komarê (tarixî cîmhûriyetê), lêkolîn dîke. Ji destpêka mêjûya komarê ve, ilim, çawa di planê resmî de hatiye pêşvebirin, çawa rastiyên civakî-sosyolojîk tune hesabandîye û inkar kirîye, raber dîke. Uniwersîte, di rewşa damezranê (mîsesêke) ku politîka inkarker a îdeolojîya resmî çêdîke û belav dîke de ye. Zanistyar inkarê meşrû dîkin, derewê sor (teşwîk) dîkin. Ne wek komîsyonên dadmendî (edlî), lê wek komîsyonên siyasi wezîfe dîkin. Ne bi zanîna zanistî, bi gîlî û inkarê paxav (îtibar) Înkâr kirin û tune hesabandîna netewekê ne şêleke zanistî ye. Bi binlingîrîna hebûna netewekê têkoşîna demokrasîyê nayê dayîn. Mafên mirovî nayên parastin. Kurdistan welatekî perçekirî û parvekirî ye. Netewa Kurd hatiye bi mêtîngêh-vexîstî (kolonîzekirin). Hemû mafên wê yê nê demokratîk û mirovî hatine xesbkirin. Vatîniya (wezîfa) ku dîkeve ser milên zanistiyarekê, ne tesdîqîrîna wê rewşê ye. Bi navê ilm, meşrûkirîna wê rewşê nî ne. Tam bi vajayî, divê li avayîya îdeolojîya resmî, ya ku xwe spartîye inkar û derewan, rexne bê te girtin.

Lê mîxabin, li Tîrkiyê, ilm, li ser bîngeheke resmî hatiye avakirin û pêşvebirin. Zanistyar, bi qandî ku avayîya îdeolojîya resmî, ya ku xwe spartîye inkar û derewan, parastîne û jê re xulamî kirîne, ji aliyên madî û manewî ve hatine xelatîrî. Car carna bi parlamentêrî û wezîrîyê jî hatine xelatîrî. Lew re, di mêjûya Komarê gîşt de, tu zanistiyarekî, çî jî nav unîwersîtê çî jî dervayê wê, xwe nedaye ber rexnegirtîna li wê avayîya îdeolojîya resmî, ya ku xwe spartîye inkar û derewan. Tam bi vajayî, hemû xebatên wan jî bi damezranvexistîne inkar û derewan re xizmet kirîne...

Aliyekî dî nî meselê, ku meriv gelek diheyîrîne jî ev e; ku kesên zanistyar li hember rexnen Beşikçi ketîne nav bê dengîyeke daimî. Dîgel rexnen xwe î li dij xebatên

bi sedan mamostên unîwersîtan û zanistiyarên xwedîyê kariyerên navnetewî, Beşikçi, jî van kesan tu bersîveke zanistî negirtîye. Li hember wê yekê, rêkxrawên zîlm û tadekariyê bi rê ketîne. Dadgeh bi rê ketîne. Pirtûkên wî berhevkirîne û cezayên gran danê.

Lê belê, wek me li jor jî gotibû, tîştê li ber çavan ev e; ku jîyanê bi xwe heq daye Beşikçi. Tevgera rîzgarîxwazîya netewî û cvakî ya ku li Kurdistanê pêlvedîde, wek bûyereke siyasi jî vedîxuyê. Dîgel 60 salên tevgerên asimilasyon û jenosîdê bê dilovani, hebûna netewa Kurd nehatiye wînda kirin û nola realîteke berbiçav li rastê ye... Dengê Beşikçi, berde ku di nav diwarên girtîgehan de bê te birandî, pêl bi pêl bi ser diwarên girtîgehan re diqelibe û li her aliyê belav dibe...

Dewleta Tîrk, inkarkirîna netewa Kurd didomîne, zanistiyarên Tîrk. bo ku jî wê siyaseta îdeolojîya resmî, ya ku xwe spartîye inkar û derewan, re kalanên zanistî bibînin hin jî didî ber hev (mîsabeqe dîkin). Girtîgeh tîje û bi dev re ne. Û jî ber namekê 10 sal ceza dan Beşikçi. Her çend bi serê meriv ve neçe jî, rasti her ev e: jî ber namekê 10 sal ceza...

Xwezayî (tebî) pîrs, mina me li jor jî got'em li ser rawestîyan, bi birandîna dengê xebatkarekî zanistîyê ve ne sinorkirî ye. Ew, jî hîlweşîna pergala xwe î ku li ser derewan ava bûye dibîzîdî. Dîtîrsîn, ku kîtleiyên ku serên wan bi îdeolojîya resmî hatî dagirtî rastiyê bibînin û hin bîbî. Ew dîxwazî rastiyên xwîni, yê nê mêjûya komarê, ku bi hîncîqandîna berberîya (mîxalefeta) demokratîk û bi zîndan û sê daran, bo qîrkîrîna netewa Kurd bi tevgerên asimilasyon û jenosîdê ve tîje ye. veşêrî. Dîtîrsîn ku ev rasti derkevî ber ronahîyê. Lê belê, mêjû ber bi pêş ve wêrdîguhure. Rasti derdî-kevî rastê. Ew dengê mirovên dilawer, ku dîxwazî di zîndan de bîfetsînin, bi ser diwarên zîndan re diçe û belav dibe. Hêza kirdayetiyên 60 salan, bo şîkandîna van lîberxwedanên pîrozbayî tîr nekîr. Hovîtîya generalên lep bi xwîni jî wê tîr neke...

## TIRÊJA BERBANGÊ

Bixemline  
Tirêja BERBANGE de  
Wêjên

kurdi

Roni bike  
Tirêja BERBANGE de  
Helbest û çirokên

Netewi

Bixemline  
Tirêja BERBANGE  
Bi peyv û gotnên

Geli

Rêkûpêk bîkî  
Tirêja BERBANGE de  
Rêzîmanê

Kurdi

Têkûz û yek bîkî  
Tirêja BERBANGE de  
Zaravên

Kurdi

Têkoşîn bîkî  
Tirêja BERBANGE de  
Bo rîzgarî û wekhevî

Şoreş Zîrek

## EM BIBIN HEVAL

Yekîtî jî me re divê  
De werî em bîbîn heval  
Jî bo welat bîdî ser rê  
Hevalno em bîbîn heval

Destan têtî nav destên hev  
Em pîştan bîdî pîştî hev  
Em rast bîkî dîl û tev dev  
Bîrano em bîbîn heval

Daxwaz dîr e, rê ber kevîr  
Barên gran î li ser mil  
Divê 'm xebat bîkî jî dîl  
Kurdîno em bîbîn heval

Li ser rêçek rast bîbîn yek  
Bî top û tîfîng, dest bî çek  
Jî bo welat bîbîn bîrek  
Kurdîno em bîbîn heval

Bîrîndar we sîlav dîke  
Jî bo yekîtî ban dîke  
Ala nav-gelî radîke  
Mîrovno em bîbîn heval

Bîrîndar

## ÇEND GOTIN LI SER NIVISANDINA DENGARÊN "DÎTIN" Ê

Murad Yilmaz

Kurdi zimanê mîleteki bîndest e. Jr ber bîndestîya Kurdan a bî sed salan ve ye, ku zimanê wan jî ne tenê bê xwedi û bê parastin maye, her wîha êrişek zor jî lê hatiye kîrîn. Welatên ku Kurd xîstine bin nirê zordestîyê, jî bo windakirina zimanê kurdi, rê nemaye ku nedabîn ber xwe. Wek hemî mêtîngehkaran, mêtîngehkarên Tirk, Faris û Ereb jî dîzanibûne, ku di jîna mîleteki de, zîman cihêki pîr grîng digre û di pêşdexistina bir û bawerîya mîli de navgînek himi ye. Jî ber vê yekê jî êrişên xwe yê mezîni hov dane ser zimanê kurdi. Nivisandî û axaftîna Kurdi qedexe kirine. Kar û barê hindekarîyê bî zîmanê xwe pêk tinî; edebîyat, folklor û hebûnên çandî yê dî nî texrîb dîkî.

Zîmanê me, di bin hoyên wîlo dijwar de, bê dîbîstan, bê alîkarîyek dewletî û bê akademi xwe gîhandîye heta îro. Hê gelek zîmanên bî alîkarîya dewlet û akademiyan tîn pêşvexistî, pîrsgrêkên xwe nebişaftîne. Îcar tîşteki xweristî ye, ku pîrsên zîmanê kurdi hê pîrtîr û girantîr bî. Çî di warê rêzîman, rastnivîsî û bêjan de be û çî jî di warê xwendî, nivisandî û axaftî de be gelek pîrsên zîmanê kurdi li hêvîya helkîrîne ne. Jî bo xwerûkirina zîman, rastnivîsandî û bî cîh kirina rêzîmanê li ser esaseki zanîstî, gelek rê li ber me ye.

Lê divê, em jî vê yekê nekevî bê meferîyê. Ger em ne di qonaxek bîlînd de bî, ne di destpêkê de ne jî. Bî saya nivîskar û zîmanzanên me, di warê rêzîman, xwendî û nivisandî de esasek hatiye danî. Gav bî gav bêjeyên nav zîmanê me firetir û xwerûtîr dîbî. Xwendî û nivisandîna zîman di nav gel de

bela dibe. Qeyd û bendên giran hatîne şikandî; di pêşdeçûnê de yê ku carnî em lê dilikumî kevîr û kuçikên li ser rê ne.

Bî vê bawerîyê, di vê nivîsara xwe de em dixwazî li ser pîrsek jî van rawestî: Pîrsek di warê nivîsandîna zîmanê kurdi de... Her weki em gîş dîzanî ku hê yekîtyek di elfaba Kurdi de pêk nehatiye. Di roja îroyî de Kurd sê elfaban bikartînin; Kurdên Kurdistanî İrân û İraqê bî tipên Erebi, yê Sovyetîstan bî tipên krîlî û yê Kurdistanî Tirkî û Sûrî jî bî tipên latîni dînvîsî. Ev rewş, bendekî ye li ber pêşdexistî û xurtkirîna yekîtiyê û xwerûtîya zîman.

Her wîha Kurdên ku elfaba latîni bikar tinî jî, hî nî tipan jî hev cuda dînvîsî. Ev tip, wek em hemî pê dîzanî dengdarên 'dîtin'ê, ango dengên 'î' û 'i' ne. Ev dengdar jî bal pîranîya Kurdên Tirkîyê ve wek ku me nivîsîye tîn nivîsandî. Lê Kurdên Sûrîyê û hî nivîskarên Kurd ku li dervayî welat dijî jî dengdarên 'dîtin'ê bî tipên 'î' û 'i' dînvîsî, ango datînin 'dîtin'. Vî awayê nivîsandîna van dengdaran, bî Celadet Alî Bedîrxan dest pê bûye. Awayê yekem jî jî bal Kurdên Kurdistanî Tirkîyê, li Tirkîyê hatiye destpêkirî.

Ev cuda-nivîsî, heta îro wîlo dom dîke. Heta jî demê ve ye, ku di nav nivîskar û xwendevanên Kurd de dîbe sedemê raberîzîne (mînaqêşê) jî. Lê yê ku pîrtîr li ber vê cuda-nivîsandîne radîbî, kesên ku alî awayê duwe nivîsî. Ew dibêjî; nivîsandîna dengdarên 'dîtin' bê nivîsandî. Gava vê yekê tinî jî xwe dispêrî hî spartekan. Dibêjî; berî her tîştî ev tipên dengdar ên ku jî bal Kurdên Tirkîyê bî awayê yekem (Weki-i-î) tîn nivîsandî, ne ti-

pên Kurdi, yê Tirkî ne. Dengdara 'î' ya di elfaba Tirkî de, jî ya Kurdi kurtîr e. Dengê ku di Kurdi de heye jî ya Tirkî dirêjtîr e. Loma jî, em nîkarî bî 'î' ya Tirkî -ku dengêki kurt dîde- bînvîsî, divê em bî tipa 'i' ya Kurdi bînvîsî. An na, ev nabe dengê Kurdi, dîbe dengê Tirkî. Ev yek jî zîrarê dîde zîmanê kurdi. (Heta tî bîra mî, ku carekê xwendevanekî namek rê-kîrbû jî kovara 'Armanc' re û gotîbû: jî ber ku hî kurdiya xwe bî tipên Tirkî dînvîsî, hî jî xîzmeta mehandîna (asîmîle kirîna) zîmanê kurdi dîkî.)

Ev kes dibêjî; Tirk bî xwe jî jî ber ku bêjeyên farîsî, kurdi û erebi di nav zîmanê wan de hene- dema, ku di bêjekê de dengdara 'dîtin' ê ya yekem were bî tipa xwe ya 'î' nanivîsî, bî tipa 'î' dînvîsî.

Sedemekî dî, ku tinî jî ev e: Dibêjî; ev elfaba latîni bî Celadet Alî Bedîrxan ketîye nav Kurdan. Himê elfaba latîni li gor zîmanê kurdi jî bal wî ve hatiye avêtî. Esasê rêzîmana kurdi wî danîye û bî xwe jî zîmanzanek bûye. Loma, divê mîrov esasê ku wî di warê elfabê de danîye, negûhêre.

A dî, dibêjî ku jî bîli Kurdên Kurdistanî Tirkîyê tu Kurdên perçên dîne bî awayê yekem nanivîsî, vî awayî nanasî. Loma jî tevlihevî û perçebûn di zîman de çêdîbe, yekîtya zîmanê kurdi pêk nayê.

Bî îzîna we, em dixwazî li ser van rexne û idîan hîneki rawestî û çend gotînen xwe yê ku hene pêşkêşî. Bî bawerîya me, hema hema tevayîya van idîan ne zanîstî ne û ne jî rexneyên bî rêzîman û himê rastnivîsandîna kurdi ve girêdayî ne. Dema ku mîrov yekoyeko wan di ber çav re derbas bîke, wê gavê hê çêtîr vê yekê dî-

bine. (Her weki, ku tê gotin ev tip ne kurdi, tirki ne...) Bî rasti elfabe bî xwe ne ya Kurdan ne ji ya Tirkan e. Elfabe, elfaba latini ye û tipên ku tê de ne ji hemî latini ne. Ne ku em û Tirk tenê vê elfabê bikar tinin, hemû miletên ewrûpayi ji wê bikar tinin. Erê rast e, hin deng hene di zımaneki de, ku di zımanên din de tunene. wê gavê ew millet ji elfaba latini tipekê li gora dengê xwe yê xas bî hin guhartinên hûrik pêk tine. Her weki (ç,ş,ı) ya me û Tirkan, (ä) ya Elman û Swêdiyan (å) ya Swêdiyan û h. w. d. 'E' ku ji nıvisandına dengdarên 'ditin' ê re dıbêjin ev Tirki ye, gelo çıma ji tipên 'ç' û 'ş' re ji nabêjin ku ev tipên 'ç' û 'ş' ji tirki ne. Lewra em ji van her du tipên di manekê de bî kartinin. Wek tipên 'ı-i'.

Ya din, ku tê gotin dengê 'ı' ya Tirki ji ya Kurdi kurtir e. Erê rast e 'ı' ya Tirki ji ya Kurdi kurtir e. Lê divê em li vir têxin bira xwendevanan; tıştê ku em li ser radiwestin ne deng bî xwe ne, nıvisandına dangan e. Ango em li ser îşaretên dangan qise dikin. Tip (weki sembol, weki îşaret) bî dangan dirêj an kurt nabin. Deng bî xwe ji tipan dernayê, ji dev dertê. Dema ku hê elfabe û ji ber vê yekê ji tipên 'ı-i' derneketibin ji Kurdan dıkarıbûn vi dengi derxin û anıha di alfabe de çı tipa 'ı' û çı tipa 'i' bê qebûl kının, Kurd wêher dengê xwe derxin. Bı guhartına van tipan wê dengê Kurdan neyê guhartın. Sedemê ku, Tirk, dema dengê 'ı' di Farsı, Kurdi an Erebi de bê, bı tipa (ango îşareta) 'ı' nişandın ji ev e: Di Tirki de bı xwe dengê wılo, lê hinêki ji ya me kurtir heye. Û dema ew hin bêjeyin Erebi, Farsı an Kurdi bı kartinin (ji ber ku dengê 'ı' ya van zımanan ji ya wan hinêki dirêjtr e.) wê gavê du dengên nêzi hev di zımanên wan de çêdike. An ji bo cudatıya van dangan bıdın nişandan, dengê xwe bı tipa 'ı' û ya din ji bı tipa 'i' dınvısm. Her wıha di Tirki de ev yek ne bes ji bo vi dengi lê ji bo dengê 'a' yê bı xwe ji tê bıkaranan. Tirk dengê 'a' ya xwe bı'a' û yê bêjeyên bıyanı (ku ji zımanê rohilat ketıbin

nav zımanê wan û hinêki dirêjtr bın) ji bı tipa 'a' dıdın nişandan. Lê di van salên dawı de zımanzanên Tirk ev ûsul ji rakırınê û anıha bes tipên 'ı' û 'a' bıkartinin. İcar em vegerın ser Kurdi. Di zımanê me de du dengên 'ı' ku nêzi hev bın nıvin bes dengêki heye. Lewra ji ne pêwıst e em vi dengi bı tipa 'ı' nişan bıkın. Kijan îşaret be, her dengêki ye û qet ji wek tê gotın, zıman ji hev nakeve, perçebûn tê de çê nabe.

Ya din di hemi zımanên Ewrûpayi de ji hin tip hene, ku mısterek in lê gava tê axaftınê li gor zımanên mirov dıbine ku di stûri û ziraviyê, yan di kurti û dirêjıyê de dengên cuda dıdın. her weki tipa 'a' di Elmani, İngılızi û di Swêdi de 'a' ye. Lê gava em bın ser xwendın û axaftınê, Elman, İngılız û Swêdi vi dengi wek hev dernaxın.

İdia dınê, (ku tê gotın esasek ji bal Celadet Ali Bedırxan ve hatıye avêtin. Divê em vi esasi xera nekin û guhartın di nıvisandına kurdi de çenekın.) Rast e, himê nıvisandına kurdi bı tipên latini ji bal Celadet Ali Bedırxan ve hatıye avêtin. Heta, ne hew di warê nıvisandınê, di tevayıya rêzımana kurdi de, gelek tıştên ku em fêr bûne bı saya xebrta vi mamosteyi ye. Em Kurd hemı ji ali zıman de deydarê wi ne. Wi çı qas bı bir bınnın û pesnê wi bıdın ji hêja ye. Lê dema dor were ser pırsên zıman divê em qet ji bir nekin, ku Celadet bes esasek avêtıye. Ewi bı xwe ji di dema jına xwe de ji destpêka nıvisandına xwe ya kurdi heta dawıyê gelek tışt guhartıne, nuh kırıne. Hejmarên kovara 'HEWAR' ê vê yekê gelek xweş dıdın nişandın. A din, imrê wi negıhaştıye û imkanên wi ji ne bûne ku li ser tevayıya pırsên zıman bısekine û wan sererast bıke. Eşkere ye, ku kesek an du-sê kes, di bınnı hoyên dijwar, bê imkanıyet de nıkarın ji. Her wıha tu awa nınnın, ku tışteki ji bal yeki ve hat dest navêjê, li ser hûr raneweste û ger rê tê de he be rewşa wê hêjatır, tekûztr neke. Hela ji bo zıman û yê miletêki wek me bınnıdest, hiç awaki wılo ni ne.

İro li ser zımanên ku bı sedısalan ve ye ketıne nıvisandınê, bı alıkarıya dewlet, akademiye zıman û nıviskarın çıyê xwe grtıye ji tê sekinandın. Di warê nıvisandınê de guherandın di wan de tın çêkırın. Her weki Elmani. Di van salên dawıyê de hin guherandın di nıvisandına Elmani de çêdıbin. Tipa Elmani ya 'ı' iro bı pıranı nayê bıkar anın û di şına wê de du 's' tın nıvisandın. Disa Elman iro di şına 'ph' de tipa 'f' dınvısm.

Xuya ye, ku guherandın di pêvajoyê de di zımanan de çêdıbin û wê çêbıbin ji. Ji bo zımanê kurdi ji ev bûyerek e. Lê divê em hay li tışteki grıng hebın. Guherandın ger li ser esasê pêşdexıstın, nuhkırın, xwerûkırın hêsakırına xwendın û nıvisandına zıman be, tışteki rast û zanıstı ye. Na, ger zıman ji ali van awayên jor de hê grantır û tevlihevtır bıke tışteki çewt e, ne zanıstı ye. Loma, iro bar e li ser me, ku em xebrta bıkın; zımanê xwe ji alıyê xwendın, nıvisandın û axaftınê de hêsatır, xwerûtır û sıvıktır bıkın. Rêzıman û rastnıvisandına zımanê xwe li cıh bıdın rûniştandın da ku gelê me ji, bıyanı ji karıbin bı hêsayı zımanê me hin bıbin.

Pıştı van çend gotınan, em dıxwazın bawerıya xwe li ser van dangan bıdın nişandan; ka gelo em kijan awayê nıvisandınê rastır dıbinın û sedemên wê çı ne. Bı ya me, rastır û ji bo pıranıya me Kurdan (her weki Kurdeên Tirkiyê) hêsatır e ku em van herdu dangan wek 'ı' û 'i' bınvısm.

Sedemê yekem ew e, ku weki me li jor got, rexneyên ji bo awayê vê nıvisandınê tın kırın, ne rast û ne di cıh de ne. Nabin tu bend ji bo vê. A dınê, dengdara yekem a 'ditin' ê di hemi zımanên hindû-ewrûpayi yên ku bı latini dınvısm de bı tipa 'ı' tê nişandan. Weki em gışt dızanın, bı taybeti di zımanên ewrûpayi de dengêki wek dengê duwem ê 'ditin' ê ni ne. Bes dengê yekem di zımanê wan de heye û ew ji vi dengi, ne bı tipa 'ı', bı tipa 'i' dıdın nişandın. Rastır û çetır e, ku em vi dengê di zımanê xwe de wek wan hemıyan bı ti-

pa 'i' bî nav bîkîn. Dimine dengê zîmanê me yê duwem ku dî 'dî-tî'n' ê de jî heye. Ev deng dî zîmanê Ewrûpayîya de ni ne. Xuya ye, ku jî bo vi dengi wê tipek elfaba me jî ya wan cudatîr be. Vi dengê me yê jî yê wan zêdetîr jî, çê-tîr e ku em bî tipa 'i' bî nav bîkîn. Sedemê çê tîrîya wê jî ev e: Em dîzanîn ku dengê 'i' jî, dengê 'i' jî jî dawîya çîrîkê dertê û du dengên nêzi hev in. Bes yek zîrav û dirêj, a dîn kurt û stûr e. Her weki tê zanîn, hema hema dî hemî zîmanan de, dirêjî, zîravî an hîşkayîya dangan bî hin xalên (nîqtên) ser an bîn tipan tên nîşandan. 'c' û 'ç', 's' û 'ş' û 'û' û 'u' yê Kurdi wîlo ne. Ev herdu dengên ku em lî ser dîsekînan jî, dîvê bîbîn 'i' û 'î'.

Sedemeki dîn jî ev e: pîranîya Kurdan (Kurdên Kurditana Tîrkiyê) ne bî zîmanê xwe be jî, tipên latîni yê bî vi awayî dînan. Çavên wan hîni van tipan

bûne. Kurdên perçên dîn, jî ber ku bî tipên erebî dîxwînin, jî xwe ne ku hîni van tipan nebûne, hîni elfaba latîni bî xwe jî nebûne. Helbet bî vêya çesda me ne temamê Kurdan e. Hinek Kurdên perçên dîn hene ku gava zîmaneki Ewrûpayî hinbûne, tipên latîni jî naskîrîne. Lê eşkere ye, ku ev kes dî nava gel de gelek kê mîn. Loma jî dîvê mîrov bîpîrse, ma gelo dî çîyê tipên jî bal pîranîya gel de naskîrî, çîma emê hin tipên nenas bîkar bînin û karê xwe bîkîn du kar?

A jî ber van sedeman, bî bawerîya me, dî nîvisandîna Kurdi ya bî tipên latîni de, dîvê herdu dengdarên 'dî'tî'n' ê bî tipên 'î' û 'i' bî nîvisandîn. Ev yek, hîm rastîr, hîm çê tîr û hîm hêsatîr e.

Bî destûra we, berî ku em vê nîvisara xwe xelas kîm, em dîxwîzîn vê yekê jî bî ber çav xîm, ku bî texmîna me, ne ku Celadet Alî Bedîrxan bî taybetî tî-

pa 'î' rastîr dîtîye û wê dî şûna 'i' ya jî bal her kesî ve naskîrî dî şûna 'i' de bîkar anîye. 'HEWAR' dî dema ku Fransîz lî Sûrîyê bîn derdîket. Dî çapxane û dektîloyên Ewrûpayîyan de jî tipa 'i' nî ne. Loma jî jî mecbûrî tipa 'î' jî bo dengê 'i', û jî bo dengê 'î' jî tipa 'î' bîkar anîye. Jî ber vê yekê jî dîvê mîrov nebêje ku na Celadet lî ser vê yekê hîr rawestîyaye, ev rastîr dîtîye û bîkar anîye. Pîştî wê, çasî ku me zanîbû lî jor jî me da xuya kîrîn ku tu sedem an bûyêr nî ne, ku pêwîst e em vê bîkar bînin, an na wê zîman xera bîbe.

Bî raya me, îsrara dî vê rîyê de jî serhîşkîyê pêştîr tu tîşt nî ne. Îcar, ger mesele serhîşkî be, dîvê em dî bir bînin ku jî ber serhîşkîya me Kurdan e, ku heta îro me gelek tîşt wînda kîrîne.


## X A Ç E R Ê Z

### RASTE ÇEP:

- 1- Kesê ku kar dîke, xebatkar. Pêlav
- 2- Ne buha. Dî elfaba kurdi de tipa yekem.
- 3- Genîm ba dîbe şûnda ew dîmine. Lî Kurdistanê navê bajareki, ku zozanê wê bî nav û deng in.
- 4- Roja ku dî pey pêncşemê re tê.
- 5- Lî hînek cîyan jî "pêş" re dîbêjîm. Golîka du-sê salî ya mê.
- 7- Kesê neçandî- Em lî ser dîmeşîn (vaja)
- 8- Gava radîbe toz û dûmanê jî bî xwe re radîke. Lî hînek cîyan jî peyvîkê re tê gotîn.
- 9- Reşaya bînê sêlê. (berepaş).- Sebîr, aram
- 10- Pronavê kesemînê pîrejîmara sîsyân.

### JORE JÊR:

- 1- Feyde.- Keseki jîna wî an mêrê wê bîmre, jê re tê gotîn.
- 2- Dî destê we de ye, hîn dîxwînin.
- 3- Kesê ku nabîhîze (berepaş)
- 4- Berê mêran bî derpê re lî xwe dîkîr. - No, an bî şewat.
- 5- Pronavê kesemînê yekem. Wucûd -beden-, term.
- 6- Fîkr, ide. - Wek kûsiye, lê dî avê da dîjî.
- 7- Ne kevn e. -Manzel, dî xaniyan de çavî.
- 8- Tevde, hemî (berepaş). Lî rojhîlata navîn hînek netew jî vê jêzayê tên (berepaş)
- 9- Dî kurdi de pêvekên dawî yê nî fiilên mesdar (berepaş). Herfek bêdeng bê sêrî dîbe "Dîn".
- 10- Bî zaravayê dîmîlî "ta, ben". -Bavê kar û mêrê bîzînê.




lavkîrîna weşanên Komal yê navçeya Dîyarbekîrê, dawê hate vekîrîn. Dawê hin jî berdeyam e.

Dervayî van pîrtûkên jorîn, hîm pîrtûkên ku Beşikçi spartîne çapxanê lê ne hatîne weşandî hene ew jî evane ne:

Zagona Dêrsîmê 1935 û Qîrkîrîna Dêrsîmê, Qetliama Özalp û Bûyera 33 derban û Parvekîrîna Emperyalîst lî ser Kurdistanê


Jî bo ku rê lî tevaya xebatên çapxanê hatîye girtî, çapxane van pîrtûkan nîkane çap bike.




" NEXWEŞXANE DÊ KESÊN KU BI TIRKÎ NIZANIN

MUYAYENE NEKIN "

KAMPANYAI  
DIVÊ AMBLEMÊ-  
KE BERBANGÊ  
HEBE. GELEK  
XWENDEVANÊN  
BÊRBANGÊ DÎ  
VÊ BAWERİYÊ  
DE NE. LEW RE,  
ME JI BO AM-  
BLEMÂ BER-  
BANGÊ KAMPAN-  
YAKÊ VEKIRIYE.  
AMBLEMÂ LI  
KÊLEKÊ JI BÔ  
VÊ ARMANÇÊ  
HATIYE ÇÊKIRIN.  
AMBLEMÊN KU  
JI ME RE BÊTIN  
ŞANDIN WÊ DI  
KONGRA FEDE-  
RASYONÊ DE  
TÊKEVIN DENG-  
DANÊ. AMBLEMÂ  
KÛ BI SERKEVE  
WÊ JI ALIYÊ  
BÊRBANGÊ VE  
BÊTE XELAT  
KIRIN.



**KURDISTAN**



M. M. Ste

www.arkurdil.org